

## Çima we zarok anî dinyayê?

Di demeke ku li her derê cîhanê şer û kirîzên ewlehî, aborî û siyasî rû didin û gur dibin, kuştin bûye mîna rijandina dilopên avê. Lê hêj jî zarok tên dunyayê. Lê zarok anîn ne tenê berdewamiya cureyê mirovan e, biqasî ragihandineke hebûnî ye... *Sorgul Şêxo/R-2*



## Bilindbûna qrîzê...

Piştî êrişa Îsraîlê ya Îlona 2025an li ser avahiyeke li navçeya dîplomatîk a Leghayfiyê, ku tê de kesayetên sereke yên tevgera Hemasê diman, serokatiya Qatarê ne tenê li hember otorîteya rayedaran, ewlehiya welat û heta herêmê... *Kurdistan Lezgiyava/R-7*



## "Aryenên çavşîn û porzer..."

Çand û zimanê Arî li Rojhilata Navîn, Ewropa, Asya û Hindistanê belev bûne. Hin zanist û derdor, çand û zimanê kurdî (Aryenî) wekî zimanê Hind-Ewropî nîşan didin, berovajî nîşan didin. Mîna herikîna ava çemekî ku berovjî bikin... *Rohat Bulut/R-11*


*29 Îlon - 5 Cotmeh 2025*
*Hejmar:* 302
*Buha:* 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e


# Waştişê ziwanî polîtîk o

Hemserekê Şaxê Egitim Senî yê Amedî yê 2yinî Serhat Kiliçî va ke waştişê perwerdeyê ziwanê dayîke polîtîk û pedegojîk o û coka polîtîkaya perwerdeyê ganî goreyê îxtîyacanê komelî bêra viraştiş la çi heyf o ke Tirkîya de perwerde çi rey goreyê raştîyanê komelî nêame dayîş. Kiliç dîyar kerd ke Tirkîya de perwerde muhendîsîya komelî sey yew hacetî ame bikarardiş




Hemserekê Şaxê Egitim Senî yê Amedî yê 2yinî Serhat Kiliçî seba muhîmîya perwerde ziwanê dayîke va ke 2012î ra nat wendegehan de kêmî-xirab kurdkî sey dersa weçînite yena dayîş la no bes nîyo, dersê weçîniteyî çi rey cayê perwerdeyê bi ziwanê maye nêgenê. Kiliç wina va: "Ma bîyarê vîrê xo, dersê weçîniteyî sey vergirewtişê waştişê perwerdeyê bi ziwanê maye amebî dayîş. Dewlete waşt ke bi dersanê weçîniteyan û çend gamanê xapînokan çimê şarî besto. Coka ra roja verêne ra ma vanê ke: 'ma perwerdeyê bi ziwanê maye wazenê û têkoşînê perwerdeyê bi ziwanê maye danê.' La nê dersê weçîniteyî verê asîmîlasyonî nêgenê. Coka ma ganê waştişê xo temamî perwerdeyê bi ziwanê maye wazenê. Emser menga Nîsane de sey şaxanê Egitim Senî yê Amedî ma perwerdeyê bi ziwanê maye ser o komxebate viraşte. Na komxebate de modelê cîya cîyayî etud kerdî û înan ser o munaqaşe kerd. Helbet xeylê modelî est ê merdim eşkeno pêşnîyaz biko la hem goreyê rewşa komelê ma, hem zî goreyê raştîya Tirkîya modelo ke vejîya vernî "Esasê ziwanê maye de perwerdeyo zafziwanî" bî. Ewropa û xeylê cayanê dinya de perwerde zi zafziwanî yeno dayîş û serkewte yo. Waştişê perwerdeyê ziwanê maye polîtîk o..." *Roportajê Lêl Amedî/R.4*

## Kurd, kurdî, têkoşîn û statu

Li gor zagonên gerdûnê yên herî xwezayî, civakî, jiyanî, dîrokî û zanistî pirsgirêkek heta ku neyê çareserkirin an jî ji holê neyê rakirin jî rojevê jî dernakeve û her dem derdikeve pêş û di her qadeke têkildar de xwe dide der. Ji bo me kurdan wek gelek mijarên din, mijareke ku ji sed sala zêdetir e hê nehatiye çareserkirin, hebûna xwe parastiye û hê jî bi awayekî nûjenkirî, bi hemû xedariya xwe di rojevê de ye mijara dagirkerî û mêtingeriya li Kurdistanê ye, ku wê têkildar rewşa zimanê kurdî ye; ku hê jî bi reng û awayên cur bi cur hewl tê dayîn ku zimanê kurdî bê dorpêçkirin... *Heval Dilbihar/R-5*

## Qonaxa gavên duyemîn

Qonaxa gavên duyemîn ne "Pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê" ye. Ji ber ku pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê mijara qonaxek an gavek din e. Qonaxa gavên duyemîn; pêvajoya avakirina bingeheke zagonî ji bo gavên ku heta niha Ocalan û PKKê avêtine ye. Ev jî bi giştî peywira dewletê û desthilatê ye. Abdullah Ocalan û PKK di vê qonaxê de bi serê xwe tiştekî ku bikaribin bikin tune ye. Mesela nikarin ji meclisê zagonan derbixin. Abdullah Ocalan ji bo pêvajoya aştiyê û civaka demokratîk erka xwe bi cih anî, PKKê jî hewcedariyên bangewaziya ku jê re hatibû kirin pêk anî. Dor dora dewletê ye... *Cahît Kirkazak/R-7*

# Divê Tirkiye vê firsenê ji dest bernede

Helwesta dewleta tirk a ku li şûna entegrasyona demokratîk, polîtîkayên asîmîlasyonê dimeşîne, ne tenê xelet e, lê xeternak e jî. Dewlet, kurdan wekî "metirsiyeke ewlehiyê" dibîne, ne welatiyên wekhev û xwedî çandeke resen dibîne. Ev nêzîkbûn, ji ber dîroka înkarê, berjewendiyên siyasî û metirsiyên jeopolîtîk e. Asîmîlasyon, bi qedexekirina zimanê kurdî, polîtîkayên kayim û redkirina mafên bingehîn, armanc dike nasnameya kurdî ji holê rake. Ev, berevajî banga Rêber Apo ye, ku di çarçoveya "Civaka Demokratîk" de nasnameya Kurdî diparêze... Dewleta tirk, bi vê helwestê, ne tenê firsenda aştiyê winda dike, lê di heman demê de krîza demokrasiyê ya li Tirkiyeyê jî kûr dike. *Nivîsa Felemez Ûlûg/R-6*




Hevserokê Ji Bo Mafên Mirovan ê Cîhanê û Demokrasiya Ewropa Yekîtiya Parêzeran ELDHEê Urko Aiartza tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxandin û got: "Li gorî zagonan tecrîd li dijî rêgezên mafên mirovan ên bingehîn e. DMMEyê binê "Mafê Hêviye" xêz kiriye." Urko Aiartza, wiha axivî: "Piştî banga Ocalan dê îzolasyona siyasî rê li pêşiya çareseriyê venake." Urko Aiartza bal kişand ser helwesta Tirkiyeyê ya li dijî biryara DMMEê ya Mafê Hêviyê û got: "Divê bersiveke erênî bidin. Dê Tirkiye bibîne ku dema vî mafî nas bike, dê qezenc bike û sûdê bigire." Urko Aiartza ev tişt jî got: "Pêşniyara Ocalan a ji bo têkiliyên gelê kurd û tirk a li ser esasê azadî û demokrasiyê û ji bo hemû gelan li ser esasê wekheviyê, firsendeke wekî zêr e..." *R-3*

## Talîban ji bo jinan xeterî ye

Hevseroka PENa-Kurd Rojbîn Perîşan der barê pirtûkên jinan ku li aliyê rejîma Talîban ve hatine qedexekirin axivî û ev tişt anî ziman: "Li Naperûşkên Talîban ên li dijî beden û zihniyeta jinan tên direjkirin ne tenê ji bo jinên Efgan, hem ji bo jinên Rojhilata Navîn hem jî ji bo hemû jinên cîhanê talûkeyek e. Û divê hemû jin vê talûkeyê fêhm bikin, şermezar bikin û li dij derkevin."... *R-2*



## Civîna 80yî ya NY

Berî her tiştî divê navê vê rêxistinê were guhertin. Jiber ku ev rêxistina Dewletên Yekbûyî ye, ne ya yekîtiya neteweyan e. Ya hêja, divê bi rastî bibe rêxistina Netewên Yekbûyî Jiber ku ev rêxistin nûneriya netewan, gelan, civakan, baweriyan û hwd. nake. Belê, tenê nûnertiya dewletan dike, lewma berjewendiyên gelan naparêza belê berjewendiyên dewletan diparêze. Hema ji gelên cîhanê, bi tenê em bala xwe bidin nûnertiya du gelan; ma gelo di nava civînên vê rêxistinê de nûnerên gelê Filistîn û gelê Kurdistanê hat xuya kirin?..."

*Ahmet Aktaş / R-8*

# ‘Rejîma Talîban ji bo hemû jinan talûke ye’

## Hevseroka PENa-Kurd Rojbîn Perîşan li ser pirtûkên jinan ên ji aliyê rejîma Talîban ve hatine qedexekirin axivî û wiha: “Talîban li dijî azadiya jinan e, ne tenê ji bo jinên efgan, ji bo hemû jinên cîhanê talûkeye.”

| Xecê Şen


Li gorî agahiyên BBCyê Talîban, di destpeka serdema nû ya perwerdehiyê de pirtûkên ku ji aliyê jinan ve hatine nivîsandin ji mufredata zanîngeha Afganistanê derxistine. Dîsa dersên li ser mafên mirovan û taybetî jî li ser mafê jinan ji mufredatên nû yên perwerdehiyê derxistine û 140 pirtûkên jinan jî ji mufredatê hatine derxistin. Her wiha hemû zaningehên Afganîstanê agahdarkirine ku dê êdî 18 ders neyên dayîn. Li ser vê mijarê rayedarên Talîbanê diyar kirine ku ev ders “ bi prênsîbên Şerîetê û polîtîkayên pergalê re bi nakok in.

Em der barê pirtûkên jinan ku ji aliyê rejîma Talîban ve hatine qedexekirin û dersên ku ji mufredatên zanîngehê hatine derxistin de bi hevseroka PENa-Kurd Rojbîn Perîşan re axivîn.

Rojbîn Perîşan di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser pergala pewerdehiya Afganîstanê û rejîma Talîban wiha got: “Zext û qedexe, zilm û neheqî kengî û li ku hebe, bêguman wê demê dengê berxwedan û azadiyê jî bilind dibe. Min bal bir ser serdema azadiyê. Lê tenê min bal nebir ser hêvî, daxwazek an jî retorîkekê; ev wekî rastiyekê li pêşiya me disekine. Li kîjan erdnîgariya cîhanê dibe bila bibe, li her derê ku zilm û qedexe hebe, berxwedan jî heye û li her derê ku berxwedan hebe, jinên ku ji hebûna xwe haydar in hene. Di dîrokê de, diyar e ku tu têkoşîneke civakî bêyî beşdariya jinan serketî nebûye. Lê belê di têkoşînên civakî de yên ku jinan cihê xwe tê de girtine û negihaştiye encameke li gor hatiye xwestin, em nikarin wekî têkçûnekê rave bikin. Wê demê kêm dimîne. Jin dema ku hebûna bi nasnameya xwe biparêze, wê demê serhildana xwe jî bi teşeyên cuda hildibijêre. Em dikarin di vê mijarê de jinên Efganî jî binirxînin”.

**Jinan jiyanê rêxistin kirine**

Rojbîn Perîşan di axaftina xwe de bal kişand ser rêxistin û têkoşîna jinên Afganistanê û wiha pê de çû: “Afganistan bi dîrok, çand û avahiya xwe ku gelek avahiyên etnîkî yên cuda dihewîne, erdnîgariyeke xwedî kok e. Û mixabin, tevî hemû dewlemendiya xwe û belkî tenê ji ber vê yekê, ew bûye erdnîgariyeke ku dagirkerî û şer qet ji ser kêm nebe. Di şerên hêz-îktidarê de, di dagirkeriyên çandî û leşkerî de, herî zêde jiyana civakî bi xisarê rû bi rû maye. Dîsa jinan di vê serdemê de ev jiyan honandine, neqişandine û bi rêxistin kirine. Tevî hemî dagirkeriyan jinên Efganî sekneke bi hêz nîşan dane, bûne xwedî helwesteke bi hêz, tevgereke jinan a çalak dane nîşandan. Her kesên di deh salên borî de xwendine û şopandine vê yekê dizanin. Tevgereke jinan a bi bandor ji bo zihniyeta baviksalar û serdestiyê xetereke tirsnak e. Loma jî ev zihniyet ji bo naperûşkê xwe li jinan bixe dixwaze tevgera jinan biçewisîne; ji bo tevgera jinan hilweşîne, yek bi yek berê xwe dide jinan. Bi dehan mînakên vê yekê di dîroka dawî ya Efganistanê de hene. Hemû jinên Afganî bi recimkirin, qamçîkirin, lêdana bi daran û bi binaxkirina zindî, dihatin cezakirin û hewl dihat dayîn ku bi rêbazên wiha wan bi zorê bikin kole. Bi tevahî jin ji jiyana civakî hatin qutkirin; berê laşê wan girtin û ew hepiskirin. Wan digotin qey wê bi vî awayî xwe bigihêjin hişê wan. Em bûn şahid, di serdemeke navîn a



kurt a dîrokî de jinan di qada civakî, zanistî, perwerde, tendirustî, wêje û hunerê de xwe dan xuyakirin. Ev jî tê wê wateyê ku hepiskirina laş tenê serdestiyeke xapînok e. Lê wan dev ji vê xapandinê bernedan. Vê yekê xwe di mînaka Talîban de jî da xuyakirin. Ji bo serdestî bê mayindekirin Talîban di serî de berê xwe da jinan. Û hewl da gav bi gav li her qadên civakê jinê dûr bixe, deng û gotina jinan kêm bike, xeyal û ramanên jinan tarî bike. Her wiha me dît ku Talîban hewl dide jinan wekî hebûneke bi lanet nîşan bide. Demeke berê ya kurt me dît di erdhejê de, di bin karesatê de bi dehan jin bi zaneyî nehatin rizgarkirin. ( Bi sedema ku jin in dest wan nedan ). Jinên Afganî yên bi birîndarî hatin rizgarkin ji ber bijîşkên jin tunebûn terkî mirinê hatin kirin. Ev qirkirina jinan e, ti ravekirineke din a vê yekê tune ye. Weke ku we vê dawiyê di nûçeya xwe de destnîşan kir, qedexekirina pirtûkên ji hêla jinan ve hatine nivîsandin û dûrxistina jinên ciwan a ji perwerdehiya akademîk beşên çalak ên qirkirina jinan in. Naperûşkên Talîban ên li dijî beden û zihniyeta jinan tên direjkirin ne tenê ji bo jinên Afgan, hem ji bo jinên Rojhilata Navîn hem jî ji bo hemû jinên cîhanê talûkeyek e. Û divê hemû jin vê talûkeyê fêhm bikin, şermezar bikin û li dij derkevin. Bi taybet ev qirkirina gotin û ramanê ya di salvegera şoreşa ‘Jin Jiyan Azadî’ de derketiye pêş, ne tesaduf e. Şoreşa Jin Jiyan Azadî li hemû cîhanê belav bû. “

**Nirxên gerdûnî**

Rojbîn Perîşan wiha dawî li axaftina xwe anî: “Bê guman, nirxên PENA Kurd û PEN International dihewînin û diparêzin, di serî de mafên mirovan, azadiya ramanê û azadiya derbirînê ne. Ev nirx di heman demê de gerdûnî ne. Rastiya ku yek ji komîteyên bingehîn ên di nav PENê de hatine damezrandin Komîteya Nivîskarên Jin e. Ev komîteya bi qasî girêdana wê ya bi nirxên gerdûnî re, di heman demê de çarçoveya berpirsiyariya wê jî nîşan dide. Ez bawer dikim di serdema pêş de, dê plansaziyên li gor berpirsiyariyên ku girtiye ser xwe, pêk bîne. Bêguman di vê serdema azadiyê de pergalên desthilatdar dixwazin heqîqet di tariyê de bimîne. Lê hûn wekî kedkarên çapemeniya azad di vê serdema wiha de heqîqetê dişopînin, hûn heqîqetê derdixin holê û hûn bi wêrekî heqîqetê diparêzin. Ez keda we ya kedkarên çapemeniyê pîroz dikim û di xebatên we de serkeftinê dixwazim.”

# Zarokek berî pirsa: Çima we zarok anî dinyayê? Çêdibe



Sorgul Şêxo

Di demeke ku li her derê cîhanê şer û kirîzên ewlehî, aborî û siyasî rû didin û gur dibin, kuştin bûye mîna rijandina dilopên avê. Lê hêj jî zarok tên dunyayê. Lê zarok anîn ne tenê berdewamiya cureyê mirovan e, biqasî ragihandineke hebûnî ye, ku mirov bawer dikin ku ev cîhan hêjayî ji nû ve avakirina bi rêya wê ye, ya na. Di cîhaneke ku her mirov tên kuştin de, çima zarokên nû çêdibin? Carinan zarokek berî pirsa: Çima we zarok anî dinyayê? Çêdibe. Nezanîna sedema ku çima ez an jî em zarokek çêbikin, sûc e derheqê zaroka/ê nû tê dunyayê de. Bi çavê zarokan li zarokan nayê nêrîn, wekî amûrek an jî çareseriyekê ji bo kirîzekê, tê bikaranîn. Zarok anîn dibe çareseriyek efsûnî ji bo her krîzekê. Mînak ji bo nakokiya zewacê, zarokek çêbikin. An jî ji bo tenêtiyek kujer dîsa zarokek çêdikin û herî zêde jî ji bo ku jin û mêr ji zextên civakê xwe biparêzin û xilas bikin, dîsa diçin zarokek çêdikin.

**Ne dermanê birînan e**

Wekî ku zarok ji bo dermankirina birînên ku wê/î çênekiriye, tamîrkirina têkiliyên ku wê/î nehilbijartine û hilgirtina barê biryarên ku nehatine nîqaşkirin ji qêrîna xwe ya yekem ve, çêdibe. Zarok dibe mexdûrên biryarên nehatine nîqaşkirin, jiyanek bê ewle û bêparastin. Jiyanek ne li gorî zaroktiya wan, zarok zaroktiya xwe najîn, xeyal û xewnên wan paşxistî dimînin. Ji bo anîna zarokekê têghiştinek dûalî pêwîst e, an jî zarokan çênekin û nekin qurbana sîstemên baviksalarî ku hebûna wan nas nake. Zarok fatûreya şaştiyên biryara dê û bavan didin. Ji bo jibîrkirina mijarekê zarokek çêdikin, ev çawa dibe? Ya zora mirov diçe ew e ku nahizirin çima zarok tînin dunyayê, biqasî ku dixwazin bibin dayik û bav.

**Têkiliyeke şikestî sererast nake**

Jin ji bo ku ji civakê re îspat bike ku ew jineke baş e zarokekê/î çêdike. Mêr jî ji bo ku bêje ez mêr im, car din zarokan çêdikin. Hevjîn ji bo ku ji civakê re bidin nîşan ku zewaca wan zewaceke zindî ye, dîsa zarokan çêdikin. Pirs li vir ev e, îleh gerek zarokek çêbibe heta ku civak çavên xwe ji hevjînan re bigre? Civak her bipirsiyar e, ev rastiyek e. Zarok derman e an jî neynika têkiliyan e, mirov êdî nizane civakê çawa razî bike. Ji xwe cîhana ku em di nav de dijîn têra xwe bi nakok e, gava ku em nizanibin çima zarok çêdikin jî ew bar girantir dike û çareser nake. Zarok têkiliyeke şikestî sererast nake, şikestinê di nav malbatê de zêde dike. Zarok anîn tenêtiyê çareser nake, wê tenêtiyê duqatir dike. Kirîzê çareser nake, berpirsiyartiyên nû li ser dayik û bav zêde dikin.

**‘Zarok bi debara xwe tê’**

Ya herî xirab ku civak xwe pê îqna dike ku zarok bi debara xwe tê ye. Dema ku mirov ji dayik an jî bavekî pirs bike çima di vê rewşê de, ku kirîzên aborî û şer hene zarok çêdikin, bersiv wiha tê: zarok bi debara xwe tê. Çawa zarok bi debara xwe tê? Malbatek xizan be, nikare xwe xwedî bike, zarokên wan ji mafê xwe yê perwerdehî û tendrustiyê bêpar in, çawa dikarin barekî din zêde bikin û zarokeke/î din bînin dunyayê? Mirov matmayî dimîne, ji ber mesele ne meseleya domandina nesil e.

Ji lewra ev hevok li welatê me wekî ku ayetek be, wekî ku qanûneke gerdûnî ya bê guman be, tê gotin. Lê pirs ew e ku ma debara jiyanê bi zarok re çêdibe an civak dê û bavan neçar dike ku bêtir feda bikin? Debara ku bi zarok re tê gelo madî, hestiyarî an jî xeyalî ye? Debara zarok pêre nayê, zarok dema tê dunayê pêdiviyên wê/î zêde dibin û wiha jî barê dayik û bav girantir dibin. Ev rastiyek ku dayik û bav naxwazin pê bifikirin. Gava malbat xizan be, wê pêdiviyên zarok ji kur bîne? Ji hewayê ji asîman wê were an jî parsekiyê li kolanan bike, an jî zarok wê bê cil, bê pêlav û perwerde û bê xwarin bin. Çînek ji civakê wiha ye û yê herî zêde jî li gundan.



**Civak xwe jî berpirsiyar nabîne**

Dabînkirin bi belgeya jidayikbûnê ji ezmanan nayê. Belê, ew ji keda dê û bavan, ji şevên bêxew ên dayikan, ji fikarên bavan, ji aboriyeke bêrehm û ji civakeke ku ji te dixwaze ku zarokên te hebin û dûv re jî eger tu wan “rast” mezin nekî, te berpirsiyar dibîne. Civakek wiha ye ji te dixwaze û te jî berpirsiyar dibîne. Para xwe nabîne ger zarok bê tendrustî û bi derûniyeke nebaş mezin bibin. Xwe berpirsiyarê anîna zarokan dibînin, lê xwe berpirsiyarê pêkanîna xewn û xeyalên wan nabînin.

**Ji wan re nivînek luks tê kirîn**

Ji bo lîstina bi zarok re, parvekirina kenekî û hembêzekê dem têrê nake û şermekê ji xwe re dibînin, ji ber di civakek de dijîn dayik dayik e û bav jî bav e. Zarok di malek tijî evîn de çêdibin, lê nikarin wê îfade bikin û bi hevre parve bikin. Guhdarkirinê li wan ferz dikin û rê ji fikirînê re nahêlin. Di jiyanek sînordarkirî û dorpêçkirî de zarokan mezin dikin, piştre dipirsin çima zarokên me wiha mezin dibin? Wan hîn dikin ku “divê” tu zarokek wiha be, cihê ji “bijartinekê” re nahêlin. Di civakê de mêranî bi hejmara zarokan tê pîvandin, ne bi kalîteya têkiliya wan bi wan re.

**Zarok ne projeyek e hebûnek e**

Zarok anîn divê biryarek be ku li ser bingeha, amadebûna girtina berpirsiyariya mirovekê/î nû. Divê ew ne bertekek li hember zexta civakî be, ne rêyek ji bo revîna ji tenêtiyê, an jî hewldanek ji bo sererastkirina têkiliyek şikestî be. Zarok ne projeyek e ku xwe îspat bike, lê hebûnek serbixwe ye, bi mafê ku di hawîrdorek ku ji wan hez dike, ne ku wan îstismar dike de ji dayik bibe.

**Hewceyê evîna ducarî nedin dinyayê!**

Dayik û bav divê ku li ser bingehê malbatek demokratîk zarokên xwe mezin bikin, lê beriya wê divê ku dayik û bav bi xwe têghiştî bin. Eger hun nizanin hun kî ne û çima zarok tînin dunyayê, sibe zarok mezin bibe wê heman pirsê ji xwe û we bike, ger bersiv neyê zanîn tehlûke ye. Eger hûn nizanin çawa ji xwe hez bikin, kesekê/î ku hewceyê evîna ducarî ye, nedin dinyayê.

**Dem hatiye ji nû ve pênase bikin**

Li welatê me, dem hatiye ku zarokanîn ji nû ve pênase bikin. Ne wekî kiryarek biyolojîk, lê wekî biryarek felsefî. Ne wekî erkek civakî, lê wekî berpirsiyariyek exlaqî. Zarokan di dema ku hun hîn hişmendiya baviksalarî diparêzin de, neyinin dunyayê. Zarokên keç neyînin dunyayê, ger hun nikaribin wan hez bikin, bi maf bikin û wan biparêzin û wekî şermekê li wan nenêrin.

**Malbatek demokratîk**

Malbatek demokratîk di vê serdemê de pêwîstiyek e. Hevjiyanek azad divê ku bibe biryarek jêneveger û ya herî girîng hembêzkirina zarokan e. Wan tenê nehêlin û ber bi astên perwerdehî û zanistî yên jor ve bibin. Ji bo wan bibin palpişt, pişta wan neşikînin û bila biserbilindî di vê cîhanê de bimeşin û bijîn. Bila nefikirîn dawî li jiyana xwe bînin, bihêlin ji jiyanê hez bikin û serbixwe bin.

# Nexşerêya Ocalan bi qasî zêr bi qîmet e

Hevserokê ELDHê Urko Aiartza der barê nexşerêya ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêşkêşî Tirkiyeyê kiriye de anî ziman ku ew bi hêvî ye ku hikûmet vê firsendê binirxîne û got: “Nexşeya Ocalan pêşkêş kiriye bi qasî zêr bi qîmet e.”

Mehmet Alî Ertaş


Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 15ê Sibata 1999an heta niha li Girava Îmraliyê di yek hucreyê de tê girtin. Ji 2019an heta 2025an parêzer nekaribûn biçin îmraliyê û piştî 6 salan parêzer çûn Îmraliyê. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan piştî bi şandeyê re hevdîtin kir, bi rêya şandeyê banga Aştî û Civaka Demokratîk kir û ji bo çareseriyê nexşerê pêşkêşî Tirkiyeyê û gelên cîhanê kir.

Hevserokê Ji Bo Mafên Mirovan ê Cîhanê û Demokrasiya Ewropa Yekîtiya Parêzeran (European Association of Lawyers for Democracy & World Human Rights-ELDH) Urko Aiartza der barê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin, nirxandin kir û got: “Li gorî zagonan tecrîd li dijî rêgezên mafên mirovan ên bingehîn e. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (AÎHM) binê “Mafê Hêviye” xêz kiriye. Li dijî cezayê hucreyê sînorên hişk danîne. Tecrîda demdirêj û tecrîda bêdawî li gorî hiqûqa navneteweyî li dijî mirovahiyê ye. Muameleyeke biçûkxistinê ye û li dijî hiqûqê ye. Gelek rêxistinên mafên mirovan destnîşan dikin ku şert û mercên ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê de ye, li dijî standartên mafên mirovan in. Ev rewş binpêkirina standartan e.”

Hevserokê ELDHê Urko Aiartza, destnîşan kir ku piştî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo çekberdanê banga dîrokî kir, domkirina îzolasyona siyasî, li pêşiya firsenda dîrokî dibe astang û wiha axivî: “Piştî banga Ocalan îzolasyona siyasî rê li pêşiya çareseriyê venake.”

Hevserokê ELDHê Urko Aiartza bal kişand ser helwesta Tirkiyeyê ya li dijî biryara DMMEê ya Mafê Hêviyê û wiha axivî: “Divê Tirkiye bersiva çima biryara DMMEyê pêk nayne bide. Ez bi xwe bi hêvî me ku di demeke nêzik de ev rewş bê guhertin. Min peyamên ku ji hikûmeta tirk û siyasetmedarên tirk hatin bi baldarî guhdar kir. Eger ew bi xwe mantiqa xwe bişopînin, li gorî vê mijarê divê gaveke erênî bavêjin. Divê bersiveke erênî bidin. Ez bawer dikim ku dê Tirkiye bibîne ku dema vî mafî nas bike, dê qezenc bike û sûdê bigire.

Prz. Urko Aiartza li ser çalakiyên dostên kurdan ên ku 2 sal berê bi dirûşmeya “Ji Rêber Abdullah Ocalan re Azadî, ji Kurdistanê re statuya siyasî” berdewam dikin û nêzikatiya Konseya Ewropayê ya li dijî daxwazên Kurdan jî rawestiya û wiha berdewam kir: “Mixabin Yekîtiya Ewropayê û Konseya Ewropayê ji ber cotstandartiyên xwe û bêser û beriya xwe li gelek herêman baweriya xwe ya hemberî mirov û civakê winda kiriye. Van bangan nabîne anku naxwaze bibîne, wekî saziyên parazvanên mafên mirovan û parazvanên demokrasiyê êdî her ku diçe rewşa wan lawaz dibe.



Urko Aiartza bal kişand ser 7 xalên ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji bo çareseriyê pêşkêş kiribû û her wiha nirxandinên wî yên ji bo tifaqa gelê Kurd û Tirk û wiha lê zêde kir: “Pêşniyara Ocalan a ji bo têkiliyên gelê kurd û tirk a li ser esasê azadî û demokrasiyê û ji bo hemû welatiyên Tirkiyeyê li ser esasê wekheviyê, firsendeke bi qasî zêr bi qîmet e. Ji bo şerê bi dehan salan berdewam kir bi dawî bike, ji bo aştiyeke mayinde ava bike, şenseke rasteqîn pêşkêş dike. Ez bawer dikim ku partiyên siyasî û hikûmeta Tirkiyeyê qîmeta vê firsendê dîtine û di encamê de dê bersiveke erênî bidin.”

Hevserokê ELDHê Urko Aiartza, bal kişand ser hewldanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên 32 salên dawyê yên ji bo aştiyê û wiha lê zêde kir: “Abdullah Ocalan 32 sal in gelek caran agirbest îlan kir. Peyamên aştî û demokrasî dan. Lê dewletê bi polîtîkayên înkarê bersiv da daxwazên Tirkiyeyê. Hem li derve û hem jî li hundir di aliyê samîyeta Abdullah Ocalan a ji bo aştiyê de fikar pir hindik in. Îsrara dewletê ya di polîtîkayên înkar û tundiyê de xizmeta avakirinê nake. Tenê şer û bêîstîkrariyê kûr dike. Ez bi hêvî me ku hikûmeta tirk dê bibîne ku ev polîtîka feyde nade tu kesî. Ez bi hêvî me ku dê vê firsenda aştiyê hembêz bike. Dîsa di vê rewşa dîrokî û krîtîk de divê aliyê kurd bêtir bi sebir tev- bigere.”

***Wergera ji Îngilîzî: Hîvda Çelebî***

# Dê bingeha kongreya êzidiyên cîhanê ava bikin

Gabrîel Başo

Êzidiyên dîasporayê, di 13-14ê Îlonê de Konferansa Êzidiyên li Dîasporayê li Hannoverê pêk anîn. Piştî konferansê Kongreya Êzidiyên li Dîasporayê (KED) ava kirin. Êzdiyan bi dirûşmeya “Bi rêya diyalogê – Ji bo Rêxistinkirin û Dezgehkirinê” konferans pêk anî.

Kesayetiyên êzidî, ji oldar, siyasetmedar, rewşenbîr, nivîskar û hunermendan, ji çar aliyên cîhanê beşdarî konferansê bûn. Piştî konferansa 2 rojan 31 biryar hatin girtin. Siyasetmedar û Endamê Komîteya Amadekar a Kongreya êzidiyên li Dîasporayê (KED) Alî Atalay li ser armanca konferansa li Almanya pêk hat axivî û got: “Civaka êzidî hem li welat û hem jî li derveyî welat ji bo ji nûve xwe bi rêxistin bike, rêxistiniya xwe nûjen bike, xwe bi hêz bike û bersiva fermana dawî bide, ev konferans pêk anî. Ji bo careke din kes nikaribe hewldaneke wisa di xwe de bibîne û nikaribe li dijî vê civakê komkujiyan pêk bîne, êzidî xwe bi rêxistin dikin. Nêzî 450 hezar êzidî ji axa xwe qut bûne û berê xwe dane dîasporayê. Organîzekirina vê civaka li dîasporayê xebateke mecbûrî bû. Li ser vî esasî bi tevlêbûna 450 delegeyên ku ji Amarîka, Fransa, Belçîka, Hollanda û gelek welatên din kongre pêk hat. Me dixwest em li ser axa xwe vê konferansê pêk bînin. Em armanc dikin ku li ser axa xwe ya pîroz li Şengalê konferansekê pêk bînin. Ji bo vê yekê xebat têne kirin. Em bawer dikin ku dê di rojeke nêzik de ev pêkan be.”

Alî Atalay, li ser êzidiyên koçber bûne jî agahî dan û got: “Nêzî 100 hezar ji bakurê Kurdistanê nêzî 70-100 hezarî ji rojavayê Kurdistanê, nêzî 150-200 hezarî ji başûrê Kurdistanê û nêzî 50 hezar êzidî ji kafkasyayê koçî Ewropayê kirine. Piştî fermana 2014an a bi destê DAIŞê pêk hat, ev koçberî gihişt asta herî jor. Wê demê nêzî 200 hezar êzidî koçber bûn. Di dîroka êzidiyan de koçberiya herî mezin piştî fermana 2014an bû. Sedema vê koçberiyê zilm û tundiya dijwar a DAIŞê û dewletên herêmê bû. Baweriya êzdiyatiyê û civaka êzidî bi ax û welatê xwe ve pir girêdayî ye. Ji ber vê yekê tu kes bi kêf û qîma xwe welatê xwe terk nake. Ev koçberî ji mecbûrî bû.”

Alî Atalay, bal kişand ser encama niqaşên konferansê û wiha lê zêde kir: “Di konferansê de 31 xal ji encamnameyê derket. Deklerasyonê bingeha xebata siberojê ye. 31 xalên ku ji encama konferansa KEDê derket, dê bibe esasê kar û xebatê. Armanca sereke ya KEDê dê di asta herî bilind de bi hemû rêxistinên civakî, siyasî û saziyên dewletê re hevdîtinan bike. Yekî KE, NY, Rêxistinên Mafên Mirovan û saziyên civakî re hevdîtinan bike da ku ev bawerî û ev civak tune nebe û bê parastin. Dîsa ji bo şert û mercên êzidiyên li ser axa xwe dijîn baştir bibe û bibin xwedî heq, hiqûq û statu têdikoşe. Ji bo baweriya wan û ola wan, dîroka wan û hebûna wan bê qebûlkirin û hurmet bê nîşandan. Ji bo Şengal bibe xwedî statuyeke taybet û jin di meclisa baweriyan de cih bigirin biryar hatin girtin. Di biryaran de ji bo ola êzidiyatiyê li welatê ku êzidî lê dijîn wekî ol bê qebûlkirin û li wî welatî dersên olî bên dîtin, ji bo di asta cîhanê de aboriya êzidiyan bê parastin û karsazên êzidiyan bêtir karibin piştgiriyê bidin hev ev kongre pek hat. Ev kongre ji 59 kesan hatiye hilbijartin. Dê di nava xwe de hevserokên xwe hilbijêre. Dê bi taybet şandeyekê ava bike. Dê meclisa şêwrê ku ji zanyar akademîsyenan pêk tê, ava bike. Dê jin zêde di kongreyê de cih bigirin. Ev kongre dê bibe bingeha kongereya êzidiyên cîhanê û ji bo vê yekê xebatê bike.”

Alî Atalay, herî dawî bibîr xist ku baweriya êzidatiyê gelek bi axê ve girêdayî ye û wiha got: “Tu ol û bawerî bi qasî êzidiyan bi axê ve girêdayî tune ye. Ji ber vê yekê berê civaka êzidî her tim li warê xwe ye. Hinek ji wan 50-60 sal in li Ewropayê ne lê dîsa cenazeyên xwe dişînin warê xwe. Ji bo vegerê her tim xebatek tê kirin. Xebata vegera welat, divê xebateke sereke ya vê kongreyê be. Ji bo vegera êzidiyan hêsan bibe dê kongre xebatê bike. ”



# Sal bi sal koçberi zêde dibe

Sosin Gulo

Li tevahiya welatên cîhanê sal bi sal koçberî û penaberî zede dibe. Li tevahiya cîhanê di sala 1970yî de 84 milyon û 460 hezar koçber hebûn. Lê 50 salên dawî ev hejmar gihişt 271 milyon û 642 hezar koçberî. Tenê di 2023an de ji 714 hezar û 579 welatiyên Tirkiyeyê koçî Ewropa û Amarîkayê bûn

Di cîhanê de herî zêde li welatên ku şer û zextên rejîma dewletê lê pir bin, penaberî jî li wir zêde ye. Milletên Yekbûyî bi boneya balê bikişînin ser mafên penaberan û der barê kesên ku bi zorê ji cihên xwe koçber bûne de hişyarî û baldariyê çêke, 24 sal berê di sala 2001an de 20ê Hezîranê wekî Roja Penaberan îlan kir. Sal bi sal der barê penaber û koçberan de rapor têne amadekirin. Komîseriya Bilind a Penaberan a Milletên Yekbûyî (UNHCR) di sala 2024an de Rapora Kuruewî amade kir. Li gorî rapora di sala 2024an de hejmara penaberan li cîhanê gihişt 123.2 milyon kesan.

Bi taybetî li welatên Sudan, Sûriye, Afganistan, Myanmar, Ukrayna û Xezayê ji ber şerê heyî hejmara koçberan zêde ye. Di salên dawî de ji ber polîtîkayên şerê taybet li Kurdistanê jî koçberiya ciwanan a ber bi Ewropayê ve zêde bûye.

Li gorî rapora Komeleya Desteka Jiyanê ya di çarçoveya Roja Penaberan a Cîhanê de amade kiriye, yek ji wealtê herî zêde koçberan hembêz dike Tirkiye ye. Lê li aliyê din yek ji welatê herî zêde welatiyên wê dîşîne Ewropayê jî dîsa Tirkiye ye. Li gorî raporan nêzî 3.5 milyon penaber li Tirkiyeyê dijîn. Ji van penaberan nêzî 2.7 milyon penaber ji ber şerê DAIŞê reviyan û hatin Tirkiyeyê. Dîsa nêzî 222 hezar welatiyên Afganistan, Îran, Irak û Somayê hatine li Tirkiyeyê bi cih bûne. Li gorî raporan şîrketên kar ên li Tirkiyeyê penaberên ku ji Afganîstan, Sûrî û welatên din hatine bi keda erzan dixebitîne û welatiyên Tirkiyeyê jî dişîne Ewropayê û li welatên Ewropayê jî dîsa bi keda erzan dixebitin.

Li gorî daneyên UNHCRê li Xezayê heta destpêka 2025an ji sedî 90ê welatiyan ax û warên xwe terk kirin û koçber bûn.

Ji ber Îsraîl ji erd, ezman û bahrê ve êrişî Filistin û Xezayê dike, welatî nikarin ji Xezayê derkevin.

Li gorî rapora ÎHDê, di sala 2023an de 714 hezar û 579 welatiyan bakurê Kurdistanê û Tirkiye terk kirin û koçî Ewropayê bûn. Li gorî daneyan ji sedî 55,2ê wan mêr, ji sedî 44,8ê wan jî jin in.

Li gorî lêkolîn û raporan di 2023an de herî zêde ciwanên di navbera 20-24 û 25-29 salî de koçî Ewropayê kirin. Ji kesên koçî Ewropayê kirine, ji sedî 12,7ê welatiyan 20-24 salî ne. Ji sedî 10,8ê wan di navbera 25-29 salî de ne. Ji sedî 10,3ê wan 15-19 salî ne. Ev dane nîşan didin ku di sala 20213an de herî zêde ciwanên kurd û tirk ji Kurdistan û Tirkiyeyê koçî welatên Ewropayê kirine.

**Herî zêde dema DAIŞê koç kirin**

Li Tevahiya Sûriyeyê jî li gorî raporên 2017an ji ber şerê DAIŞê û komên çekdar ên wekî OSO, Sultan Murad, El Nusra û komên din, 13 milyon welatiyên Sûriyeyê koçî derve kirin. Di sala 2017an de nêzî 1 milyon welatiyên Sûriyê koçî welatên Ewropayê kirin. Li gorî raporên lêkolînê 6 milyon welatiyên Sûriyeyê koçî welatên cîran kirine. Nêzî 5 milyon welatiyên Sûriyeyê jî li welatên cîran dijîn. Li gorî daneyên 8 sal berê 3 milyon û 400 hezar welatî li Tirkiyeyê, 1 milyon li Lubnanê, 660 hezar li Urdunê, 250 hezar li Iraqê dijîn. Nêzî 150 hezar welatiyên Sûriyeyê jî li Efrîqaya Başûr dijîn. Dîsa 690 penaberên Sûriyeyê li welatên Ewropayê bi cih bûne. 100 hezar welatî jî li Amarîkayê bi cih bûne.

**Sal bi sal zêde dibe**

Li gorî Îstatîstîkên koçberiyê yên Neteweyên Yekbûyî di sala 1970yî de li tevahiyê cîhanê 84 milyon û 460 hezar koçber hebûn. Di sala 1980yî de 101 milyon û 983 hezar, di sala1990î de 153 milyon û 11 hezar, di sala 2000î de 173 milyon û 588 hezar, 2010an de 220 milyon û 781 hezar û 2019an jî 271 milyon û 642 hezar koçber hene. Di van salan de herî zêde mirovan koçî parzeminên Asya û Afrîkayê kiriye.

Li gorî Rapora Koçberiya Cîhanê ya Rêxistina Koçberiyê ya Navneteweyî (IOM) hejmara penaberan gihişt 281 milyon mirovî. Li gorî raporê 75,9 milyon mirov di nava welatê xwe de koçber bûne. Bi taybetî li welatê Ukrayna, Filistin, Sudan, Komara Kongo ya Demokratîk, Myanmar û Etiyopya koçberî zêde bûye.

**Berê gel li Ewropayê ye**

Li gorî daneyên TUÎKê di salên 2022-2023an de ji 316 hezar û 456 kes ji derve koçî Tirkiyeyê kirine. Di salên 2022 û 2023an de jî 714 hezar û 579 welatiyan koçî welatên Ewropayê kir. Ev jî nîşan dide ku 2 qatî welatiyên ku ji derve hatine Tirkiyeyê, welatiyên Kurdistan-Tirkiyeyê jî koçî derve kirine. Li Tirkiyeyê herî zêde ciwanên 20-24 û 25-29 salî koçî welatên Ewropayê dikin.

# VERBA MUHENDÎSÎYA KOMELÎ YA ÎQTÎDARÎ

# Ma perwerdeyê bi ziwanê maye wazenî

■ Lêl AMED

*Nê rojanê peyenan de çapemenî de derheqê dîplomayanê sexteyan xeylê xeberî vejîyayê. Seke aseno burokrasî mîyan de hetê tayê şebekeyan ra pê pereyan dîplomayê sexteyî virazîyayî, e-îmzayî bi hawayêko bêqanunî kopya bîyê. Xeylê kesan bi nê dîplomayanê sexteyan unîversîte qedênaye, unîversîteyan de bîyê akademisyen, kewtê gure. Tirkîya de hûmara bêkarî her ke şona zêdîyena. Kesê ke zaningehan ra mezûn benê nêeşkenê kar bivînê. Bi milyonan însan hende serre kede daya, xo ver o dayo bêgure maneno la tay kesî bi sextekarîye herinda înan de kewtê gureyan. No helbet merdim kamca ra ewnîyeno wa biewno pûçbîyayîşê pergalî aşkere keno. Hewna çi heyf ke Tirkîya de perwerde çi rey goreyê raştîyanê pedagojîkan yan zî îxtîyacanê komelî nêame dayîş. Tirkîya de perwerde goreyê îxtîyacanê îqtîdarî seba muhendîsîya komelî sey yew hacetî ame bikarardiş. Polîtîkayanê perwerdeyî yê asîmîlasyonîst û tekperestî hema zî domyenî.*

*Ma zî sey Rojnameyê Xwebûnî Hemserekê Şaxê Egitim Senî yê Amedî yê 2yinî Serhat Kiliçî reyde meseleyê dîplomayê sexte, kar û xebatê înan ê sendîka û bi ziwanê maye perwerde ser o qisey kerd. Kiliçî persanê ma rê bi zerrî cewab da.*

***Taybetî Amed de û heme cayê Tirkîya de problemê dîplomaya sexte çi darax de yo?***

Nê rojanê peyenan de çapemenî de derheqê dîplomayanê sexteyan xeylê xeberî vejîyayê. Ma zî bi raya çapemenîye nê çîyan ra hayîdar bîyê. Seke aseno burokrasî mîyan de hetê tayê şebekeyan ra pê pereyan dîplomayê sexteyî virazîyayî, e-îmzayî bi hawayêko bêqanunî kopya bîyê. Xeylê kesî bi nê dîplomayanê sexteyan unîversîte qedênaye, unîversîteyan de bîyê akademîsyen, kewtê gure. Goreyê zanayîşanê wezaretê karanê mîyanênî 16 şaristanan de na mesela ser o operasyonî bîyê û nezdîyê 200 kesî yenê sucdarkerdiş. Helbet no 200 kesî tena ê yê ke nê şebekeyî mîyan de yê, ê yê. Çend kesan bi no qeyde dîpomayê sexteyî girewtê nîno zanayîş. Xora bawerî bi burokrasî nêameyêne la na rewşe ra dima pûçbîyayîşê nê pergalî aşkere bî. Rewna ra ke Tirkîya de liyakat orte ra wedarîyabî, herinda lîyakatî de mulakat û torpîl esas bî. Na rewşe ma nawit ke mesela hîna giran a, êdî kes hewce bi torpîl û mulakatî nêvîneno, rasterast sextekarî bena. Amed de dîplomayê sexteyî est ê çin ê ma nêzanê, ma nêeşkenê xo biresnê zanayîşanê winayînan.

***Êyê ke bi dîplomaya sexte bîyê wayîrê karî, benê sebebê maxdûrîyetêka senîne?***

Tirkîya de hûmara bêkarî her ke şona zêdîyena. Kesê ke zaningehan ra mezûn benê nêeşkenê kar bivînê. Bi milyonan însan hende serre kede daya, xo ver dayo bêgure maneno la tay kesî bi sextekarîye herinda înan de kewenê gureyan. No helbet merdim kamca ra ewnîyeno wa biewno pûçbîyayîşê pergalî aşkere keno. Bi hezeran karmendî semedo ke muxalîfê îktîdarê sîyasî bîyê îxrac bîyê, herinda înan de kesê sextekarî neheqîye reyde gêrîyayî kar. No tena kesan mexdûr nêkeno, bi xo ya komelî helêneno. Erjê komelkî est ê ke merdimî pê ciwîyenê, wina wina nê erjê orte ra wedarîyenê.




Hemserekê Şaxê Egitim Senî yê Amedî yê 2yinî Serhat Kiliçî va ke polîtîkaya perwerdeyê ganî goreyê pedagojî û îxtîyacanê komelî bêra viraştiş la çi heyf o ke Tirkîya de perwerde çi rey goreyê raştîyanê pedagojîkan yan zî îxtîyacanê komelî nêame dayîş...

***Derheqê tespîtanê dîplomayanê sexteyan, êyê ke wezarêtê perwerdeyî de tespît bîyê, prosesêko senîn dewam keno derheqê înan de?***

Heta nika zafane dîplomayê sexteyê xusûsî unîversîteyan de aşkere bîyê, wezaretê perwerdeyî ser o yew zanayîşê ma çinî yo. La 2016 de reyna wina yew rojeve virazîyabî, heme ma vajê dîplomaya heme mamosteyan ameybî etud kerdene. La nika xebatêka winayîne çin a.

***Şima sey sendîka meselaya dîplamayanê sexteyan de prosesê huqûqî teqîp kenê?***

Merkezê ma yê Egitim Senî zaf rey dîplomayanê sexteyan ser o beyanatî dayê. Nê meseleyan de mehkemeyî çi heyf o ke bi goreyê huqûqî tênêgêrenê, coka ra lazim o ke komel mîyan de reaksîyonê xurtî bêrê nawitiş ke wa na mesela peygoş nêba. Ma zî hertim na mesela rojeve de tepîşenê ke wa bi hawayêko ciddî şêrê ser.

***Amed de hûmara endamtîya sendîkayan senîn a? Hûmara endamanê şima çi ya?***

Her serre menga Gulane de hûmara endamanê sendîkayan hetê wezaretê gureyî ra yena hesibnayîş. Goreyê daneyanê menga Gulane ya 2025î Amed de pêro têde 28198 kedkarê perwerdeyî xebitîyenê, ti ra 20484 kedkarî endamê sendîkayan ê. No dane ma nawneno ke se ra 73yê kedkaranê perwerdeyî endamê sendîkayan ê. Hûmara endamanê ma zî derdorê 9600î de ya. Ma sey Egitim Senî nika Amed de hetê hûmara endaman ra sendîkaya yewin ê. La heme şaristanan de rewşe wina nîya. Nê serranê peyenan de endambîyîşê sendîkayan vêşî bi. La çi heyf o ke no averşîyîş xozayî yan zî têkoşînê kede reyde nê, bi mudaxaleyanê dewlete wina bî. Seke şima zanê Tirkîya de tayê sendîkayî est ê ke seba menfeatê kedkaran nê, seba destê hukûmatî asan bikê ameyê ronayîş û bi nê motîvasyonî xebitîyenê. Nê sendîkayî hetê hukumatî ra yenê destegkerdiş û hûmara endamanê înan yena vêşîkerdiş. No mudaxale tena Tirkîya de nê, heme dînya de est o. Kardaran yew merhele ra pey fehm kerd ke nêeşkenê bi qedexekerdişan verê têkoşînê kede bigêrê, na reye dest pê kerd sendîkayî xo ra bestê, girewtî binê bandorê xo. Bi no qeyde vêşîbîyayîşê hûmara endambîyîşê sendîkayan êdî kardaran yan zî hukûmatan rê taluke nîyo, coka binê kontrolê xo de hûmara tayê sendîkayan vêşî kenê.

***Mamosteyê ke herêma ma de xebitîyenê hîşmendîya înan a sendîkayî senîn a? Goreyê serranê verênan rewşe senîn a?***

Taybetî serra 2016î ra pey verê têkoşînê sendîkayî ame girewtiş. Dewlete xeylê hetan ra gala bi têkoşînê sendîkayî kerde. Heme cayanê Tirkîya de rewşe wina ya la herêma ma de zext û zor o ke ma ser o ronîya hîna vêşî bî. 2016 de Amed de nêzdîyê 5 hezarî endamê ma kar ra ameyê dûrîvistiş, dima apey gêrîyayê la na rey Amed de 150 endamê ma, heme Tirkîya de nêzdîyê 1300 endamê Egitim Senî bi hawayêko bêhuqûqî îxrac bîyê. Seyan mamosteyî semedo ke dersêka bi kurdkî daye ameyî sirgunkerdiş. Îqtîdarî darbe xo rê kerd bahane û çi hêzê komelkî yê ke weşê înan nêşîyênê kerdî xezaba xo ver. Êdî demeyêk ra pey kedkarî çi heyf o ke bi îradeyê xo nêeşkayî sendîkaya xo biweçînê. Kedkarî bêçare têkoşînê kede û sendîkayî ra dûrî kewtê. La zext û zor çend vêşî bibo zî çi rey na sendîka têkoşînî ra fek vera nêda. Rojanê tewr tarîyan de zî sere nêrona, çok nêşikit. Hertim endamanê xo reyde seba heqanê endamanê xo, seba ameyoxê komelê xo, xo ver da. Netîceya xoverdayîşî de nê serranê peyenan de têkoşînê sendîkayî reyna ver bi xurtbîyayîşî şono. Ma nêeşkenê vajê têkoşînê sendîkayî zerrîya bi ma serbest o la a tarîtîye kêmî xirab diraye. La nê prosesî reyde yeno waştiş ke yew hîşmendîya sendîkawanîye ya çewte bêro pironayîş. Na hîşmendî çi ya? Yeno waştiş ke êdî sendîkayî sînorê talebanê ekonomîye de bimanê, problemanê komelî ra, êyê ke tesîrê ekonomî, cuye û ameyoxê ma kenê, înan ra dûrî bimanê. Wa kedkarî polîtîka ra dûrî bimanê. Erê wa sendîkayî bibê la wa kêfê kardaran neheremnê. Helbet no nîno qebilkerdiş, ma verba na hîşmendîye xeletî xo ver danê.

***Şima sey Egitim Sen taybetî kamcîn meseleyan ser o vindenê? Şima tewr zaf kamcîn meseleyan de problem vînenê?***

Ma sey yew sendîka, sey yew rêxistina kede verê hemîn heqanê kedkaran yê ekonomîk, huqûqî û karê xo ser o vindenê. Ma zanê ke no pergalo kapîtalîst bi temamî kedewerîye ser o awan bîyo. Kedkarî afernenê, ber anê meydan la ê berî ra bêpare manenê. Coka ma kenê ke verê hemîn kedkaran de hîşmendîye kede awan bikê. La ma xo bi rojevanê ekonomîkan sînor nêkenê. Ma zanê ke heme problemî têkildarê yewbînan ê. Erê keda ma azad nîya la komel zî azad nîyo, cinîyî azad nîyê, xoza azad nîya. Xulasa heme çîyî yewbînan reyde girêdaye yê. Coka heme problemê komelî rojeva ma de yê. Nînan ra teber ma sey sendîka beşê perwerdeyî de rêxistinkerde yê. Polîtîkaya perwerdeyê ganî goreyê pedagojî û îxtîyacanê komelî bêra viraştiş la çi heyf o ke Tirkîya de perwerde çi rey goreyê raştîyanê pedagojîkan yan zî îxtîyacanê komelî nêame dayîş. Tirkîya de perwerde goreyê îxtîyacanê îqtîdarî seba muhendîsîya komelî sey yew hacetî ame bikarardiş. Ma verba nê polîtîkayanê perwerdeyî yê asîmîlasyonîst û tekperestî têkoşîn danê. Û helbet problemê ke perwerde de yenê vernîya ma, ma înan ser o vindenê. Xeylê problemê perwerdeyî est ê ma eşkenê bihûmarê la sereyê înan de çinîbîyayîşê heqê perwerdeyê bi ziwanê maye yeno. Sey şaxanê Egitim Senî yê Amedî hetê perwerdeyî ra talebê ma yo sereke perwerdeyo bi ziwanê may o. Her serre mîlyonan reyde gedeyî heqê perwerdeyê bi ziwanê maye ra dûrî dest bi wendegehî kenê. Ma sey perwerdekaran her roj vînenê çi xisaro pîl gedeyan de yeno meydan. Gedeyê ke ziwanê xo ra teber dest bi wendegehî kenê senî bawerîya înan xo ra şikîyena. Hem hetê serkewtişê akademikî ra apey manenê hem problemanê psîkolojîkan vînenê. Sey Egitim Senî ma perwerdeyê bi ziwanê maye hem sey talebêko pedagojîk hem zî talebêko polîtîk wazenî.

***Amed de perwerdeyo bi ziwanê maye hetê şarî ra çiqas yeno waştiş? Hetê keyeyanê wendekaran ra çiqas paştî yena dayîş?***

SAMER'î çend rerran ra ver na mesela ser o yew anket viraştbî. Taybetî Amed ser o daneyî nêdayê la anket de se ra 98ê beşdaran ma perwerdeyê bi ziwanê maye wazenê vatbî. Sewbîna şîrketanê anketan de zî sey Rawest ûsn. ekserîyetê beşdaran perwerdeyê bi ziwane maye waştbî. Hem nê îstatîstîkî hem zî muşahadeyê ma gore ma eşkenê vajê heme qismê komelî nê heqî wazenê. La çi heyf o ke seba xodestkerdişê heqê perwerdeyê bi ziwanê maye bi qaso ke wazenê têkoşîn nêdanê. Çîyo ke hende tesîr bi komelî biko lazim bî ke hîna zaf biameyêne rojev, ser o hîna zaf biameyêne vindertiş.

***Goreyê şima dersê kurdkî yê weçîniteyî şarî rê bes ê?***

2012î ra nat wendegehan de kêmî-xirab kurdkî sey dersa weçînite yena dayîş la no bes nîyo. Dersê weçîniteyî çi rey cayê perwerdeyê bi ziwanê maye nêgenê. Ma bîyarê vîrê xo, dersê weçîniteyî sey vergirewtişê waştişê perwerdeyê bi ziwanê maye amebî dayîş. Dewlete waşt ke bi dersanê weçîniteyan û çend gamanê xapînokan çimê şarî besto. Coka ra roja verêne ra ma vanê ke: 'ma perwerdeyê bi ziwanê maye wazenê û têkoşînê perwerdeyê bi ziwanê maye danê.' La nê dersê weçîniteyî verê asîmîlasyonî nêgenê. Coka ma ganê waştişê xo de zî bi israr bê. Dersê weçîniteyî wa bêrê bikarardiş la nê bes nîyê, ma temamî perwerdeyê bi ziwanê maye wazenê.

***Hûmara mamosteyanê kurdkî bes a? Problemê tayînkerdişî est o?***

Nika Wezaretê Perwerdeyî de, heme cayê Tirkîya de pêro têde 150 mamosteyê kurdkî xebitîyenê. Bi goreyê nufûsê kurdan ma muqayese bikerê na hûmare birastî zaf kêmî ya, sey heqaretî ya. Nê serranê peyenan de xeylê wendekarî beşê kurdolojîye ra mezûn bîyê, înan formasyon zî girewto la nêgêrîyenê kar. Prosesê weçînayîşê dersan de wendekar û keyeyê înan kenê ke dersa kurdkî biweçînê vanê mamosteyî çin ê meweçînê, wextê tayînkerdişê mamosteyan de zî vanê derse kêmî ameya weçînayîş coka hewce bi tayînkerdişî çin o. Seke mi gama bîne zî va, kaxit ser o no sey heqî ameyo dayîş la heme cayî ra verê weçînayîşê dersan yeno girewtiş.

***Seba perwerdeyê bi ziwanê maye modelêko îdeal goreyê şima senîn o?***

Emser menga Nîsane de sey şaxanê Egitim Senî yê Amedî ma perwerdeyê bi ziwanê maye ser o komxebate viraşte. Na komxebate de modelê cîya cîyayî etud kerdî û înan ser o munaqaşe kerd. Helbet xeylê modelî est ê merdim eşkeno pêşnîyaz biko la hem goreyê rewşa komelê ma, hem zî goreyê raştîya Tîrkîya modelo ke vejîya vernî "Esasê ziwanê maye de perwerdeyo zafziwanî" bî. Ewropa û xeylê cayanê dinya de perwerde zi zafziwanî yeno dayîş û serkewte yo. Modelan ser o do munaqaşeyî bêrê kerdiş la verê hemîn ganî Tirkîya de astengîyê ke verê perwerdeyî de yê orte ra wedarîyê.

## Serhat Kiliç kam o?



Serhat KILIÇ qezaya Pîranî ya Amedî ra yo. O Unîversîteya Dîcleyî de beşa mamostetîya matematîkî ra mezûn bîyo, nika Amed de yew wendegehê mîyanîn de sey mamosteyê matematîkî xebitîyeno. Mamostetîya matemetîkî ra teber no dîwês serrî yo ke sazîyanê ziwanî û Egitim Senî de sey mamosteyê kirmanckî kursê kirmanckî dano, ey komîsyonanê hazirkerdişê materyalanê perwerdeyî û ferhengê kirmanckî de zî ca girewto. Xeylê serran ra nat Sendîkaya Kedkaranê Perwerde û zanistî (Egitim Sen) de têkoşînê kede de ca gêno. No di serrî yo ke şaxê Egitim Senî yê Amedî yê 2yinî de sey hemserekê şaxî gure keno.

# Kurd, kurdî, têkoşîn û statu



Rasterast
Heval Dilbihar

Li gor zagonên gerdûnê yên herî xwezayî, civakî, jiyanî, dîrokî û zanistî pirsgirêkek heta ku neyê çareserkirin an jî ji holê neyê rakirin ji rojevê jî dernakeve û her dem derdikeve pêş û di her qadeke têkildar de xwe dide der. Ji bo me kurdan wek gelek mijarên din, mijareke ku ji sed sala zêdetir e hê nehatiye çareserkirin, hebûna xwe parastiye û hê jî bi awayekî nûjenkirî, bi hemû xedariya xwe di rojevê de ye mijara dagirkerî û mêtingeriya li Kurdistanê ye, bi wê têkildar rewşa zimanê kurdî ye; ku hê jî bi reng û awayên cur bi cur hewl tê dayîn ku zimanê kurdî bê dorpêçkirin, bişaftin, helandin û jiholêrakirin; da ku kurd jî wek netewe tune bibin.

Bêguman ji aliyê hemû kurdên xwedî bext, bîr û hiş û aqil ve kêm zêde tê zanîn ku zimanê kurdî ji bo me kurdan tê çi wateyê û em kurd di mijara zimanê kurdî de çi dixwazin û divê çi bikin. Ku em careke din bi kurtasî jî be bi bîr bînin, em dikarin bibêjin ku zimanê kurdî, beriya her tiştî ji alavbûn û amûrbûneke têkilidayînê û veguhestina hest û ramanan gelek wêdetir e; remz û nîşane û delîla herî sereke û şênber a hebûn, xwebûn û nasnameya neteweya kurd a herî bingehîn, resen û xweser e; hêmana sereke ye ku neteweya kurd ji hemû neteweyên din cuda dike. Çavkaniya xwebûna neteweya kurd e ku ji destpêka dîroka wê heta niha hemû şîfre, kod û danehevên bîrî, hişî, giyanî, çandî, civakî û jiyanî, ji her alî ve û ji her qad û mijarê di nava xwe de hewandine, veşartine û heta roja me anîne.

Bawer im ev destnîşankirin bi tena serê xwe jî dê têrê bike ku zimanê kurdî ji bo me kurdan tê çi wateyê û girîngiya wê ji bo me kurdan çi ye. Li ser vê bingehê heqîqet ew e ku heke zimanê kurdî nebe neteweya kurd jî nikare hebe û nikare wek XWE be û XWE bijî. Heke zimanê kurdî tune bibe neteweya kurd jî di nava demê de dê ji heqîqeta XWEbûnê dûr bikeve, bibişive, bihele û dawiya dawiyê wek gelek kom, civat, gel û neteweyên din tune bibe. Ji ber ku, tiştekî ku wek xwe nebe û bi hebûn, resenî, xweserî û xwebûna xwe nejî, heqîqeta wê tiştê, heta ew tişt bi xwe jî di rastiyê de tune ye, anku nîn e. Ev rastî xwe di gelek nirxandinên zanistî yên zanyaran de jî dide der.

Gelek zanyar, zimanzan, feylesof, rêber û derdorên cuda ev heqîqet dîtine li ser girîngiya zimanê dayikê ya ji bo neteweyekê û mirovahiyê heta niha gelek pênase, nirxandin, şîrove û dahûrandinên bingehîn kirine. Yek ji van kesan jî Rêber Abdullah OCALAN e. Rêber OCALAN zimanî wek laş pênase dike, ku laş hemû lebatên giyandaran di nava xwe de dihewîne û giyandar bê laş nikarin bibin xwe û nikarin xwe bijîn.

Rêber OCALAN bi taybetî jî bi nirxandinên xwe yên wek “Zimanê dayikê ji nan û avê girîngtir e”, “Ziman bi xwe, daneheva civakî ya hişmendî, exlaq, hest û ramanên xweş in ku civatekê bi dest xistiye... Civata ku xwe gihandiye zimên wisa ye ku xwe gihandiye sedema bihêz a jiyanê...”, “Pêşketina neteweyekê bi pêşketina zimanê wî ve têkildar e” û “Kesên ku bi zimanê dayika xwe nejîn ji ajalan berjêrtir in” û “Yên ku nikaribin zimanê xwe biparêzin nikarin tiştekî biparêzin” bi rengekî zelal radixe ber çavan ku her heyber, giyandar, mirov û neteweyek berî her tiştî bi zimanê xwe dibe xwe û wek xwe dijî. Herwiha parastina zimanê xwe parastina XWE ye û her tiştê xwemalî ye. Rêber OCALAN li ser vê bingehê bi caran destnîşan kiriye ku neteweyek bêyî zimanê dayika xwe nikare bijî û zimanê dayikê ji bo neteweyan xeteke herî sor û jêneger e.

> Divê hemû kurd, azadîxwaz û aştîxwaz li ser bingeha stratejiyeke mayînde, di çarçoveya polîtîkayên diyarkirî de bi nexşerê, bername û karnameyên şênber têbikoşin

Ji ber vê yekê ye ku, zimanê kurdî ji bo me hemû kurdên XWEnas, XWEzan û XWEparêz xeteke herî sor û jêneger a jiyanî ye, ji bo me mijara bûn û nebûn, hebûn û tunebûn, man û nemana nasnameya me ya herî dîrokî, xwezayî, xwebûnî, neteweyî û civakî ye. Herwiha mijareke bingehîn a azadbûna neteweyî/civakî û azadbûna demokratîk/komunal e. Baş tê zanîn ku; kom, civat, gel û neteweyên ku zimanê wan ji holê tên rakirin an ew bi xwe ji holê radibin, tune dibin, an jî ji XWE(bûna xwe) dûr dikevin, dişibin celad û ezbeniyên xwe û di nava demê de dihelin; ku ev jî jiholêrabûn û tunebûnek e.

***Du xalên jêneger:* Têkoşîn û statu**

Gelek zelal û aşkere ye ku di serî de, Rêber Abdullah OCALAN û Tevgera Azadiya Kurdistanê; hemû tevger, partî, rêxistin, platform, înîsiyatîf, sazî, dezgeh û derdorên kurd û hemû neteweya kurd dixwaze ku kurdîkujiya nûjen bi dawî bibe, zimanê kurdî jî li her qadeke jiyanê û ji her milî ve serbest û azad be; dixwaze ku zimanên farisî, erebî, ingilîzî, almanî, tirkî û gelek zimanên din xwedî kîjan mafan bin zimanê kurdî jî xwedî wan mafan be. Ji xwe heta ku ev yek pêk neyê, ne aştiyeke rast pêk tê, ne jî civateke demokratîk.

Aştiyeke rast, wekheviyeke xwebûnî û demokrasiyeke civakî ya azadîrês û dadparêz divê beriya her tiştî di mijara zimên û hemû nirxên xwebûnî yên netew, gel û koman de pêk bên; anku divê maf û daxwazên me kurdan ên derbarê zimanê kurdî de, ku maf û daxwazên herî xwezayî û bingehîn in bên bicihanîn:

Divê kurdî bibe xwedî statuyeke fermî. Divê zimanê kurdî-ji zarokxaneyê heta zanîngehê di hemû merheleyan de- bibe zimanê perwerdehiyê. Divê zimanê kurdî, li hemû qadên fermî, civakî û jiyanî serbest û azad be; hemû astengiyên hiqûqî, siyasî û kiryarî yên li pêşiya zimanê kurdî ji holê bên rakirin, hebûn û mafên zimanê kurdî di makezagon û zagonan de bên misogerkirin. Divê navên hemû war û cih û tiştên ku berê bi kurdî bûn lê paşê wek tirkî hatine guhertin dîsa li kurdî bên vegerandin.

Ji bo ku ev yek pêk bê, bêguman divê li ser bingeha azadî, wekhevî, dadmendiya gerdûnî, demokrasiya civakî û aştiyeke rast, hem ji aliyê siyasî ve, hem jî ji aliyê hiqûqî/zagonî ve nav, ax, welat, çand, nasname û hemû nirxên me kurdan û nirxên Kurdistanî yên herî xwezayî, hebûnî, xwebûnî, dîrokî, civakî, neteweyî û azadî bên nasîn, bi awayekî fermî bibin xwedî statuya hiqûqî û siyasî.

Helbet, ji bo ku ev yek jî pêk bê, di serî de hemû tevger, partî, sazî, dezgeh, şaredarî û platform, divê em hemû kurd û hemû derdorên azadîparêz, demokrasîhez, aştîxwaz û mirovahîperwer, li ser bingeha stratejiyeke tekûz û mayînde, di çarçoveya polîtîkayên diyarkirî de bi nexşerê, bername û karnameyên şênber têkoşîna xwe, bi giyanê seferberiyê her dem, li her derê bi rê û rêbaz, alav û amûrên herî dewlemend, afirîner, hevgir, tevgir û encamgir belavtir, berfirehtir û bilindtir bikin.

Heta ku her mal, xan, mezra, gund, tax û kolaneke her navçe û bajarekî Kurdistanê wek dibistan û zanîngeheke kurdî neyê sazkirin, heta ku her wargeh û jîngeheke li Kurdistanê nebe komun û meclîseke zimanê kurdî, nebe KURDÎ-GEHek bi awayekî rast nikare bi tevahî azad û serbest bibe.

Divê em tu caran ji bîr nekin, tu tişt bi xwe pêk nayê; heta ku bayek ranabe belgek nareqise, heta ku qêrînek bilind nebe, li çar dor û milan deng venede, heta tav germ nebe berf nahele û heta ku em hespê têkoşînê ranekin çar gavan kurdî li meydana jînê ranabe ser piyan.

# Çanda şevbêrk û dengbêjiyê



Arslan Ozdemir

*“Di nav çanda Kurdan de, şevbêrk zimanê şevê ye, dengbêjî jî dengê bîranînê ye; bi hev re, ew dîroka gelekî hildigirin.”*

Di nav mîrateya çandî ya civaka Kurd de, kevneşopiyên şevbêrk û dengbêjiyê ne tenê celebekî şahiyê ne; ew di parastina bîra civakî, misogerkirina veguhestina nifşan û avakirina nasnameyê de jî cihekî girîng digirin.



Peyva “şevbêrk” tê wateya “bi hev re şev derbas kirin”. Bi taybetî li gundewarên Kurd, di demên berî elektrîkê û ragihandina nûjen de, şevên dirêj ên zivistanê bi civînên çandî yên ku mirov bi hev re derbas dikin wate digirin. Di van civînan de, efsane, çîrokên gelêrî û stran têne vegotin û sohbet têne kirin.

Şevbêrk ne tenê cihekî ji bo demên xweş in; ew di heman demê de cihekî fêrbûna kolektîf in. Zarok û ciwan ji zimanê mezinên xwe hem dîroka xwe û hem jî nirxên exlaqî fêr dibin. Bi vî awayî, Şevbêrk fonksiyonekê pêk tîne ku hevgirtina civakî xurt dike û kesan li dora nasnameyeke hevpar dicivîne.

Yek ji hêmanên herî girîng ê Şevbêrkê dengbêj e. Dengbêj bi rastî “hosteyên peyv/deng” in, çîrokbêjên destanan, vebêjên bûyerên dîrokî û hilgirên bîra kolektîf di civaka Kurd de ne.

Ji destanên evînê bigire heya têkoşînên eşîran, ji koçberiyê bigire heya çîrokên berxwedanê, dengbêj rêzeke fireh ji bûyeran bi rêya stranan vedibêjin. Di demên ku tomarên nivîskî kêm bûn, fonksiyona vê kevneşopiyê afirandina arşîveke devkî bû. Di dawetan, sersaxiyan û civînên civakî de, stranbêjiya stranan a dengbêjan hestên kolektîf ên civakê vedijandin û bîranîn zindî dihiştin.

Dengbêjî ne tenê şêweyekî hunerî ye, lê di heman demê de saziyeke civakî ye jî. Dengbêjî xemgînî, kêfxweşî, şikestinên dîrokî û ruhê berxwedanê yê civakê hildigire, wan ji nifşekî vediguhêze nifşekî din.

Şevbêrk bi stranên dengbêjan ve zindî dibûn. Ev civînên di şevên dirêj de ne guhdarîkirina takekesî bûn, pratîkeke kolektîf a fêrbûn û bîranînê bûn. Ji ber vê yekê, şevbêrk bû cihê xwezayî yê dengbêjan, û stran jî, di encamê de, di vê atmosfera çandî de kûrtir bûn û bûn hilgirê sereke yê bîra kolektîf.

***Kevneşopiya şevbêrk û dengbêjan di civaka kurd de gelek fonksiyonên girîng pêk anîne:***

Tevî asîmîlasyon û zordariyê, van pratîkên çandî ji bo parastina nasnameyê xizmet kirin.

Wan veguhestina zanîn, dîrok û nirxan di navbera nifşan de hêsan kirin.

Wan cihek afirandin ku mirov dikarin werin cem hev û hestên xwe yên hevpar xurt bikin.

Li hember qedexe û zordariyê, stranên dengbêjan wekî formeke veşartî ya dîroknivîsînê xizmet kirin.

Bi modernîzasyon, bajarvanî û belavbûna teknolojiyê re, kevneşopiya şevbêrkê bi piranî paşve çû. Lêbelê, kevneşopiya dengbêjan ji ber zordariya dewletê û qedexeyên çandî ji bo demek dirêj qels bû. Lêbelê, ew niha bi hewldanên saziyên mîna Mala Dengbêjan a Amedê tê vejandin. Wekî din, bi rêya festîvalan, çalakiyên çandî û stranên tomarkirî, kevneşopiya dengbêjiyê ji nifşên nû re tê veguhestin.

Ji dewlemendiyeke folklorîk bêtir, çanda şevbêrk û dengbêjiyê di nav Kurdan de roleke kûr di parastina bîra civakî û parastina nasnameyê de lîstiye. Îro, ev mîrat bi rêya lêkolînên akademîk û lêkolînên çandî berdewam dike, û hewl tê dayîn ku ew ji nifşên pêşerojê re were veguhestin.





# Li Tirkiyeyê terora dewletê heye



Xweşkanî
Felemez Ulug

Di rastiyê de li Tirkiyeyê pirsgirêka kurdan heye. Ger li holê pirsgirêka terorê hebe jî ew terora dewletê ye. Dewletê bi deh-hezaran gund şewitand, bi hezaran welatparêzên kurd kuştin an jî avetin zindanan. Ev teror e





Di 27ê Sibata 2025an de, Rêber Abdullah Ocalan ji girtîgeha Îmraliyê bangeke dîrokî kir. Ev banga "Aştî û Civaka Demokratîk" ne tenê ji bo çareseriya pirsgirêka kurdan e. Di haman demê de ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê û Rohilata Navîn jî xwedî girîngiyeke mezin e. Rêber Apo bang li PKKê kir ku xwe fesix bike û dawî li têkoşîna xwe ya çekdarî bîne. Ev bang, ne tenê ji bo kurdan, ji bo tevahiya Tirkiyeyê û herêmê bû derfeteke dîrokî. Lê belê, piştî heft mehan, pêvajo hîn jî di nava astengiyan de ye.

Banga Rêber Abdullah Ocalan, stratejiyeke nû ye ku şerê çekdarî bi dawî dike û li ser bingeha "Civaka Demokratîk" ji nû ve civakê ava dike. Rêber Abdullah Ocalan di nameya xwe de dibêje: "PKK, di sedsala 20an de li ser qedexekirina kurdîtiyê derket holê ku siyaseta demokratîk û hiqûqî bê avakirin." Ev bang, ji aliyê heyeta DEM Partiyê ve hate xwendin û vê bangê li cîhanê deng veda. Neteweyên Yekbûyî (NY) ew wekî "hêviya aştiyê" nirxand û ji gelek derdoran piştgiriyeke xurt ji bo vê bangê çêbû.

Aliyê kurdan, bi awayekî berpirsyar, gavên mezin avêtiye. PKKê, di Adara 2025an de, agirbest ragihand û di kongreya xwe ya 12an de biryar da ku şerê çekdarî bi dawî bike. Di Tîrmeha 2025an de, Koma Aştî û Civaka Demokratîk ku ji 30 gerîlayan pêk dihat li şikefta Casenayê ya dîrokî bi merasimeke heybet çekên xwe şewidandin. Bi vê gava dîrokî re bang li dewleta tirk hate kirin ku gavên pêbawer û hiqûqî bavêje.

Dewleta tirk, her çendî ev banga Rêber Abdullah Ocalan erênî dîtibe jî ji gotina xwe ya "terorê" gav paş ve neavêt. Rayedarên dewletê di her firstê de gotin ku qonaxeke nû ji bo "Tirkiyeya bêteror" dest pê kiriye dubare dikin. Lê belê, ev helwest, pêvajoyê wekî meseleya "terorê" dîtin û nirxandin, bi serê xwe pirsgirêk e. Di rastiyê de li Tirkiyeyê pirsgirêka kurdan heye. Ger li holê pirsgirêka terorê hebe jî ew terora dewletê ye. Dewleta ku bi deh-hezaran gund şewitand, bi hezaran welatparêzên kurd kuştin an jî avetin zindanan. Terora dewletê bi vê ve jî sînordar nema. Ji bo kurdan asîmîle bike çand, ziman, nasname, dîrok û hebûna wan qedexe kir. Li gel vê dest avêt hemû nirxên wan ên pîroz. Dewlemendiyên ser erd û bin erd ên Kurdistanê talan kir. Ger ev ne teror be çiye? Li beramberî vê terora ku di bin formê dewletê de li dijî hebûna kurd dihat meşadin têkoşîna mafdar ji kengî ve dibe teror. Divê were zanîn ku pêvajoya bi înîsiyatîfa Rêber Abdullah Ocalan hatiye despêkirin pêvajoya çareseriyê ye. Pêvajoya demokrasî û azadiyê ye. Di bingeha vê de jî li hevkirina civakê heye.

Komisyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Millî, ku di Tebaxa 2025an de, di bin banê meclisê de hatiye avakirin bi armanca zemînekî hiqûqî û siyasî ji pêvajoya Aştî û Civaka Demokrtîk re avabike dest bi xebatê kiriye. Komîsyonê heya niha 12 civîn li dar xistiye û li gelek derdorên cuda guhdar kir. Kesên di komîsyonê de axivîn bi gelemperî pêvajoya hatiye despêkirin bi erênî nirxandin lê kesên ku ji şer û rewşa aloz ya li herêmê sûd digrin li dijî vê pêvajoyê derdikevin. Divê li dijî van kesên ku bi vê helwesta xwe ya genî, civakê kurmî dikin û xeradikin helwesteke xurt a civakî hebe. Bi helwesteke yekgirtî û domdar dikare pêşî li van daxwazên şerxwaziyê û astengiyên li pêşiya aştiya civakê were girtin.

Bêgûman komîsyonê hewl da ku nêrîn û dîtinên gelek derdorên cuda guhdar bike û li gorî wê nexşerêyekê amade bike. Lê divê em vê rexneyê jî bikin. Pêvajo ne mumkun e ku bê Rêber Apo bi rêve biçe. Çawa ku em dibêjin ev pêvajo bi înîsiyatîfa Rêber Apo pêşketiye, dîtin û pêşniyarên wî ji bo vê pêvajoyê jî girîng in. Lê ji aliyê komîsyonê ve ne guhdarkirina Rêber Apo ne kêmasî weke şaşitiyeke stratejîk mirov dikare bi nav bike. Komîsyona wê di 1ê Cotmehê de pêşniyarên xwe pêşkêşî meclisê bike. Komîsyona ku li Rêber Apo guhdar nekiribe gelo dikare ji bo çareseriya pirsgirêka kurd nexşerêyeke çawa pêşniyar bike? Di vir de em dikarin bibêjin, ji vê helwesta komîsyonê diyar dibe ku dewleta Tirk bi awayekî cidî nêzî meseleyê nabe. Divê were zanîn ku ev meseleyek cidî ye û divê cidî were dest girtin.

Helwesta dewleta tirk a ku li şûna entegrasyona demokratîk, polîtîkayên asîmîlasyonê dimeşîne, ne tenê xelet e, lê xeternak e jî. Dewlet, kurdan wekî "metirsiyeke ewlehiyê" dibîne, ne welatiyên wekhev û xwedî çandeke resen dibîne. Ev nêzîkbûn, ji ber dîroka înkarê, berjewendiyên siyasî û metirsiyên jeopolîtîk e. Asîmîlasyon, bi qedexekirina zimanê kurdî, polîtîkayên kayim û redkirina mafên bingehîn, armanc dike nasnameya kurdî ji holê rake. Ev, berevajî banga Rêber Apo ye, ku di çarçoveya "Civaka Demokratîk" de nasnameya Kurdî diparêze.

Dewleta tirk, bi vê helwestê, ne tenê firsenda aştiyê winda dike, lê di heman demê de krîza demokrasiyê ya li Tirkiyeyê jî kûr dike. Eger dewlet reformên wekî serbestberdana girtiyên siyasî, pejirandina mafên zimanê kurdî û rakirina kayiman neke, ev pêvajo tenê dibe "kontrolkirina kurdan," ne çareserî. Lê belê, eger dewlet gaveke wêrek bavêje, Tirkiye dikare bibe modela demokrasiyê di herêmê de, ku hem kurd hem jî tirk jê qezenc bikin.

Di encamê de, banga Rêber Abdullah Ocalan, ne tenê ji bo kurdan, lê ji bo tevahiya Tirkiyeyê derfetek e. Dewleta tirk, bi guhertinên demokratîk, dikare vê krîzê veguherîne modelek serkeftinê. Lê bêyî gavên wêrek, ev pêvajo tenê dibe "kontrolkirina kurdan," ne çareserî. Niha, dem dema biryarên dîrokî ye. Divê were zanîn ku Aştîya rastîn, tenê bi entegrasyona demokratîk û parastina nasnameya kurdî mimkun e.

## Ji bo çareseriyê têkoşîn didome

Navenda Nûçeyan

Rêxistina DEM partiyê li Cizîrê di 24ê îlonê de starta kampanyaya îmzeyan a "Em aştiyê dixwazin, ji ber ku; em bawer dikin ku em ê Komara Demokratîk ava bikin" da destpêkirin. Kampanya dê li hemû bajaran bi stantên îmzeyan berdewam bike.

Parlamenterê DEM Partiyê Zekî Îrmez têkildarî kampanyayê û xebatên DEM Partiyê anî ziman ku ji destpêka banga Aştî û Civaka Demokratîk heta niha wekî DEM Partî di nava têkoşînê de ne û wiha got: "Em saziyên ku demokrasî û aştiyê dixwazin di nava tevgerê de ne. Em her meh rêzeçalakiyan datînin pêşiya xwe. Ji bo pêvajo di rojevê de bimîne û her kes li pêvajoyê xwedî derkeve em xebatan dikin. Me civînên gel pêk anîn. Me mîtînig pêk anîn. Me bi saziyên civakî re hevdîtin kirin. Di mehên borî de nêzî 2 hezar civînên gel li tax û gundan pêk anîn. Me bi gelê xwe re ev pêvajo niqaş kir û nirxandin û nerînên gel girtin. Em ê di meha pêşiya xwe de jî rêzeçalakiyan pêk bînin. Ji bo avakirina Aştî û Civaka Demokratîk pêş bikeve xebatên me didomin."

Zekî Îrmez, da zanîn ku li meclisê lijneyek hatiye avakirin û wiha got: "Ji bo ev lijne zûtir gavên şênber bavêje û baweriyekê bide gelê kurd û tirk, em dixwazin ev pêvajo her dem di rojeva lijneyê de be. Me di meha îlonê de kampanyaya îmzeyan, panel û konferans danîn pêş xwe. Kampanyaya îmzeyan didome. Her bajarî li gorî derfetên xwe dîroka kampanyayê diyar kir. Heta dawiya meha îlonê dê kampanyaya îmzeyan bidome. Divê her kes bi dengekî bilind daxwaza aştiya bi rûmet bike."

Hemû qeyran bi meseleya kurdan ve girêdayî ne

Zekî Îrmez da zanîn ku eger aştî pêk neyê dê pirsgirêkên li Tirkiyeyê kûrtir bibin û wiha pêde çû: "Hemû qeyranên li Tirkiyeyê bi pirsgirêka kurdan ve girêdayî ye. Heta ku pirsgirêka kurd çareser nebe pirsgirêkên din çareser nabin. Heta ku demokrasî, edalet û wekhevî neyê Tirkiyeyê, heta ku mirov nikaribe xwe li Tirkiyeyê bi rêxistin bike, pirsgirêk çareser nabin. Rewşa aboriya Tirkiyeyê û aramiya li Tirkiyeyê bi pirsgirêka kurd ve girêdayî ye. Armanca vê pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ew e ku pirsgirêka kurd bi rêya aştî û demokrasiyê bê çareserkirin. Em jî wekî gelê kurd, sazî û dezgehên kurdan ji bo aştiyeke bi rûmet pêk bê, dewlet demokratîk bibe, ji bo em karibin Komara Demokratîk ava bikin, em her dem têdikoşin û li ber xwe didin. Îro jî ev têkoşîn û berxwedan didome. Ev kampanya ku li Cizîrê dest pêkir, berdewama ve tekoşînê ye. Em bang li her kesî dikin ku li vê kampanyayê xwedî derkevin. Xwedîderketina vê kampnanayê xwedî derketina aştî û civaka demokratîk e. Xwedî derketina aramî, demokrasî û azadiyê ye."

Zekî Îrmez, bibîr xist ku ew bajar bi bajar standan ava dikin û wiha bi dawî kir: "Em li hin bajaran 2, li hin bajaran 3 standan vedikin. Li kolan û taxan standan vedikin û banga aştî û civaka demokratîk dikin. Eleqeya li hemberî van standan pir zêde ye. Xebatên me tenê bi standan bi sînor namîne. Xebatên me li tax, gund û navçeyan jî berdewam dikin û em ji bo aştî û civaka demokratîk xebatên kampanyayê didomînin."

# Daraz ji ezmûna wîcdanê derbas nabe

Zinar Ronî

Dadegeha bilind di derbarê dayîka Taybet Înan de biryareke sosret girt. Dadgeha bilind bi biryara ku gartiye Taybet Înan careke din kuşt. Dadgeh di biryara xwe de dibêje "Ji ber ku di dema xwe de serlêdan nehatiye kirin, lewma ji aliyê şêwazê ve kêm e. Ji ber vê kêmaniyê dosya nayê nirxandin." Li gorî dadgehê, serlêdan di dema wê de nehatiye kirin.

Beriya niha jî Dadgeha Bilind a Tirk û Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ji ber heman sedeman serlêdana Doza Roboskiyê betal kiribû. 34 gundiyên Roboskiyê bi balafirên şer hatibûn kuştin. Lê daraza tirk di komkujiyê de tu kêmaniya dewletê nedît. Kurd carekê bi awayekî fîzîkî têne kuştin, cara duyem jî ji aliyê darazê ve bi giyanî têne kuştin.

Dadgeha bilind di cihê ku bêje Taybet Înan çima hatiye kuştin, Çenazeyê wê çima heft rojan li erdê maye, dibêje we dereng serî lê daye. Gelo di dema xwe de serî lê dabûna dê encam cudabûya? Qet bawer nakim. Hiqûq her çiqasî ji maddeyên diyar pêk were jî dema daraz bixwaze dikare li gorî rêziknameyên giştî, li gorî peymanên navnetewî tevbigere û biryarên erênî bigire. Lê mixabin dema hiş û wijdan ne qanî be ku maf hatine binpêkirin, daraz jî ji bo betalkirina serlêdanê rêyekê ji xwe re dibîne.

Mesele ew e ku di hişmendî de li hemberî kurdan dijminatî heye. Tenê ne li hemberî kurdan li hemberî nasnameyên derveyî tirkîtiyê hişmendiyeke faşîst heye. Li Tirkiyeyê nasnameyên ku têne qebûlkirin nasmeya tirk û misilmantiya sunî ye. Ji derveyî wê heke nasnameyeke doza maf bike ew wekî 'dijmin' tê pênasekirin. Li gorî dadgeha bilind, ji ber ku kurd dijminin, Taybet Înan jî jineke kurd e, ew bûyerên bi serê wê de hatine heq e. Ji ber ku nikare vê hişmendiya xwe ya qirêj vekirî bîne ziman, vê carê jî biryara xwe li gorî zagonên hiqûqî dixe çarçoveyekê. Wezîrê Karê Hundir ê tirk ê berê S.Soylu ji polîs û eskeran re digot "Hûn tiştê hewce dike bikin, hiqûq dê piştre were." Soylu ji peywîrê hate girtin, lê niha di serî de dadgeha bilind bi giştî daraz bi heman ferasetê tevdigere. Dadgeh bi vê biryarê ji polîs û eskeran re dibêje "Ez li pişt we me."

Îro serokê dadgeha bilind di axaftina xwe de behsa giringiya serlêdanên ferdî kir. Mafê serlêdana ferdî wekî yek ji xalên girîng a hiqûqê tirk anî ziman. Herwiha dibêje: "Di 13 salan de 700 hezar serlêdan hatine kirin." Lê ji van serlêdanan çend siyasî ne, çend ji ber diyarkirina ramanê siyasî hatine kirin, çend ji van bi erênî, çend heb bi neyînî bi encam bûne, behsa wê nake. Ji ber ku piraniya dozên fikrî bi redkirinê bi encam dibin, naxwazin behs nakin.

Li Tirkiyê mafê şîn û rêzgirtina ji miriyan re her dem tê binpêkirin. Kuştin û windakirin li aliyekî, rêza ji miriyan re jî tune. Her wiha malbat bi dilekî rihet nikarin şîna xwe jî bigirin. Herî dawî li Cizîrê polîsan êrişî darbesta gerîlayê HPG Ferhat Tunç kir û piştî definkirinê destur neda malbat li mala şînê, taziyeyan qebûl bike. Ferhat Tunç berî 8 salan şehît ketibû. Dewletê piştî 8 salan hêj nû cenaze da malbatê. Ligel vê jî hem destura definê neda hem jî nehişt malbat li mala şînê tazîye dayne.


Di 6ê Îlonê de înîsîyatîfa ji mirî re rêzgirtin li Muşê panelek li dar xist. Di salonê de li ser pankartekê wiha dinivîsî: Riya diçe aştiyê di rêzgirtina ji miriyan re derbas dibe. Heke daraz dixwaze bi rastî aştiyek pêk were hewce ye êdî xwe ji hişmendiya faşîzane rizgar bike.





Cahîd Kirkazak

# Qonaxa gavên duyemîn



Li ser vexwendina Bahçelî ku Birêz Abdullah Ocalan bê meclîsê û banga fesixkirina PKKê bike, salek derbas bû. Vexwendina Dewlet Bahçelî ne tenê ji bo ku Abdullah Ocalan banga fesixkirina PKKê bike bû. Li hember vê bangê di heman demê de sozên rakirina tecrîda li ser Abdullah Ocalan, bi rêya "Mafê Hêviyê" azadbûna fîzîkî ya Abdullah Ocalan û bi gotinên "bira bê meclisê, di koma DEM Partiyê de biaxive" ji vekirina rê û rêbazên siyasetê ji bo Abdullah Ocalan jî di nav xwe de dihewand. Birez Abdullah Ocalan bersiva vê vexwendinê da û got ku: "Eger zemîna hiqûqî û demokratîk bê amadekirin, hêza min a teorîk û pratîk heye ku ez meseleya kurdan ji zemîna şer û tundiyê veguherînim zemîna hiqûqî û siyasî."

Bi vexwendina Bahçelî û bi bersivdayîna bi xwe bawer a Abdullah Ocalan, pêvajoya aştî û civaka demokratîk dest pê kir. Vê carê ji nîqaşa ka kîjan alî gavekê bavêje an dora gav avêtinê ya kê ye, dest pê kir. Ji ber ku Birez Abdullah Ocalan rola xwe pêkbîne, di xwezaya xwe de divê hin gav bêne avêtin.

Mînak, ji bo ku PKK kongreya xwe ya ku biryara fesixkirinê bigre, divê dewletê biryara agirbestê bigirta, tecrîda li ser Abdullah Ocalan rakira û ji bo azadbûna fîzîkî û xebatên serbixwe, şertên azadbûna Ocalan pêk bianiya. Mixabin, dewletê heta niha yek gav jî neavêt. Di qonaxa yekem de, hemû gav ji aliyê Abdullah Ocalan û PKKê ve hatin avêtin. Birez Abdullah Ocalan di bin tecrîdê de bang li PKKê kir ku ji bo kongreya xwe ya fesixkirinê bicive. PKK di 1ê Adara 2025an de bi biryara agirbestê û bi cihanîna banga Abdullah Ocalan bersiv da. Di 5-7ê gulana 2025an de kongreya xwe civand û biryara fesixkirinê girt. Lê ji bo çekberdanê, di hêla siyasî û hiqûqî de pêwistî bi hin gavên dewletê hebûn. Dewletê dîsa gav neavêt û barê giran dîsa danî ser milêAbdullah Ocalan û PKKê. Abdullah Ocalan, dîsa ji bo aştî û demokratîkbûna Tirkiyê bang li PKKê kir ku çek berdin an çekan bişewitînin. Li ser banga Ocalan, komeke endamên PKKê bi pêşengiya Besê Hozat bi navê koma aştî û civaka demokratîk, di 11ê Tîrmeha 2025an de li şikefta Casenê çekên xwe şewitandin û daxwaza rê vekirina li siyasetê kirin. Lê ji ber ku zemînên hiqûqî û siyasî nehatibûn amadekirin, derfeta tekoşîna siyasî tine bû, dîsa vegeriyan wargehên xwe.

Ji bo pêvajoyê gavên duyemîn: Divê di serî de azadiya fîzîkî ya Abdullah Ocalan misoger bikin. Li ser vê bingeha ku Ocalan azad bibe, azad bijî, azad bixebite û bikeve rewşeke ku karibe siyaseta xwe bike, divê şert bêne avakirin

Mirov dikare bibêje ku dewlet di nav vê salê de, xwe ji cihê xwe neleqandiye û gavek neavêtiye. Tenê mehê carekê destûra ku şandeya Îmraliyê bi Abdullah Ocalan re hevdîtin bike derketiye. Tenê carekê parêzer û malbatên girtiyên girava Îmraliyê karibûne hevdîtinê bikin. Lê tecrîd mixabin hê jî didome.

Komisyonek/lijneyek li meclîsê hatiye damezrandin. Lê ew komisyon ne bi zagonê, bi înîsiyatîfa serokê meclîsê hatiye damezrandin. Lê li aliyê din, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê anku Rojava gef tên xwarin. Her çiqas PKKê xwe fesixkiribe û çek şewitandibe jî, bi rêya balafirên şer li qada PKKê şer didome û li her derên Tirkiyê siyasetmedarên kurd û HDP an DEM Partiyê bi hinceta HDK û Komelaya Rojava tên lêpirsînkirin. Ev gef, operasyonên şer û lêpirsînên bi riya dozgeriyê yên siyasî, hemû li hember pêvajoya aştî û civaka demokratîk provokasyon in. Bi van hemû provokasyonan jî, bi înîsiyatîfa Abdullah Ocalan heta niha hat. Ji niha û pê ve jî pêvajo di qonaxa gavên duyemîn de ye.

**Qonaxa gavên duyemîn çi ye gelo?**

Qonaxa gavên duyemîn ne "Pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê" ye. Ji ber ku pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê mijara qonaxek an gavek din e. Qonaxa gavên duyemîn; pêvajoya avakirina bingeheke zagonî ji bo gavên ku heta niha Ocalan û PKKê avêtine ye. Ev jî bi giştî peywira dewletê û desthilatê ye. Abdullah Ocalan û PKK di vê qonaxê de bi serê xwe tiştekî ku bikaribin bikin tune ye.

Mesela nikarin ji meclisê zagonan derbixin. Abdullah Ocalan ji bo pêvajoya aştiyê û civaka demokratîk erka xwe bi cih anî, PKKê jî hewcedariyên bangewaziya ku jê re hatibû kirin pêk anî. Dor dora dewletê û desthilatdariyê ye.

Ji bo qonaxa gavên duyemîn: Divê di serî de azadiya fîzîkî ya Abdullah Ocalan misoger bikin. Li ser vê bingeha ku Abdullah Ocalan azad bibe, azad bijî, azad bixebite û bikeve rewşeke ku karibe siyaseta xwe bike, divê şert bêne avakirin. Divê hevdîtinên bi Abdullah Ocalan re ji destûra hevdîtinê derkevin, ji bo ku Abdullah Ocalan karibe rola xwe di pêvajoyê de bilîze, divê hevdîtinên wî bi heyetên siyasî, ronakbîr û akademîsyenan re û bi aktorên civakî re werin misogerkirin û ev hevdîtin divê di bin înîsiyatîfa Abdullah Ocalan de bin. Lewra, hevdîtinên bi destûrê nayê wateya ku tecrîda li ser Abdullah Ocalan hatiye rakirin.


Ya duyem jî, di çarçoveya entegrasyona demokratîk de, bi taybetî di warê hiqûqî de, derxistina zagonan e. Rêziknameyên hiqûqî û zagonî yên ku di çarçoveya entegrasyona demokratîk de bêne derxistin, divê ne tenê ji bo bi tevlêkirina kesên çek berdane di nav sîstemê de sînordar bimîne, her wiha divê bi berçavgirtina cihê Kurdan di nav Komarê de bênekirin.

Eger ku di qonaxa gavên duyemîn de ev her du gav werin avêtin, wê pêvajoya aştî û civaka demokratîk bi lez û bi ewle ber bi armanca xwe, aştiyeke mayînde û komareke demokratîk, ve bimeşe. Lê eger ev gav neyên avêtin û bi xwestin hemû bar bi kelîbandin li ser milê Abdullah Ocalan, wê demê tê wateya ku ev îrade vê pêvajoyê naxwazin. Ji ber vê yekê divê dewlet û desthilatdar mil bidin ber vê barê û pêwistiyên qonaxa gavên duyemîn bi cih bînin. Bila baş bê zanîn ku aştî, aramî û demokratîkbûna Tirkiyê û Rojhilata Navîn bi çareserkirina mijara gelê kurd pêkan dibe.



Kurdistan Lezgiyeva

# Bilindbûna qrîza Rojhilata Navîn



Piştî êrişa Îsraîlê ya Îlona 2025an li ser avahiyeke li navçeya dîplomatîk a Leghayfiyê, ku tê de kesayetên sereke yên tevgera Hemasê diman, serokatiya Qatarê ne tenê li hember otorîteya rayedaran, ewlehiya welat û heta herêmê, di heman demê de li hember serweriya wê jî rastî dijwariyek cidî hat.

Bêguman, serokatiya Qatarê, ligel dewletên din ên Konseya Hevkariyê ji bo Dewletên Erebî yên Kendavê (GCC), dê vebijarkên bersivdayînê li hember êrişa Îsraîlê ya li ser Dohayê û binpêkirina qanûnên navneteweyî, bi îhtîmaleke mezin bi şêwirmendiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, binirxînin.

Di heman demê de, pirsa çima parastina hewayî nekarî bersivê bide êrişê, hîn jî nehatiye çareserkirin. Mimkun e ku ev operasyon ji hêla sazûmana Amerîkî ve hatibe hevrêzkirin û pejirandin û beşek ji planên "parastina aştiyê" yên Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Donald Trump be. Êrişa dawî ya Îranê li ser baregeha Amerîkî ya El Udeyd li Qatarê, ku wekî tolhildan li ser êrişa Amerîkî ya li ser binesaziya nukleerî ya Îranê hatiye kirin, jixwe emsalek çêkiriye ku dikare di biryardana Îsraîlê de were bikar anîn.

Êrişa mûşekî li ser baregeha dîplomatîk a welatê navbeynkar ku platforma danûstandinê ava dike, kuştina endamên koma danûstandinê û karmendekî Wezareta Karên Hundir a Qeterê siha xwe avêt ser çareseriya aştiyane ya berdewam a pevçûna Filistîn-Îsraîlê û vegerandina rehîneyan, ku Trump bi rêkûpêk bang dike. Kiryarên wiha yên Îsraîlê ne tenê hewldanên aştiyê têk dibin, lê di heman demê de dibe ku nîşan bidin ku xwestekek heye ku pevçûn ji sînorên wê yên erdnîgarî wêdetir berfireh bibe.

Êrişa Îsraîlê li ser paytexta Qatarê di têkiliyên navneteweyî de emsaleke xeternak çêkiriye û nebûna cezayan li dijî kiryarên weha dikare di qanûna navneteweyî de jî pirsgirêkeke cidî çêbike û bibe sedema zêdebûna girîng a rewşa jixwe aloz li seranserê Rojhilata Navîn. Di nebûna şermezarkirineke tund û pêşxistina mekanîzmayan ji bo pêşîgirtina li êrişên din ên li ser Qatar û welatên Konseya Hevkariyê ji bo Dewletên Ereban yên Kendavê de, bersiva vê êrişkariyê dikare ambargoyeke petrolê li ser bazara cîhanî be, mîna ya ku ji hêla Rêxistina Welatên Îxracatên Petrolê yên Ereban (OAPEC) ve di sala 1973an de hatiye ferzkirin.

Qatar bandorek girîng li ser bazarên enerjiyê yên cîhanî dike, di nav de yek ji mezintirîn bazarên petrol û gazê- Yekîtiya Ewropî, ku piştî herêma Asya-Pasîfîkê duyemîn îtxalkarê herî mezin ê Qatarê ye. Ji ber hewldanên Dewletên Yekbûyî û YEyê yên ji bo zextkirina Rûsyayê piştî pevçûna li Ukraynayê û nexwestina hin welatên Ewropî ji bo hevkariya bi Moskowê re, di nav de di sektora enerjiyê de, hevkariya enerjiyê ya di navbera Qatar û welatên Ewropî de bi taybetî girîng e. Ev yek bi taybetî ji bo welatên Ewropî pir girîng e: tevî ku DYA di îxracata gazê ya pêşeng de ye bo YEyê, gaza Qeterê bi qasî %19ê dabînkirina gaza giştî ya YEyê pêk tîne.

Her çiqas îhtîmala tedbîrên tolhildanê yên bi vî rengî kêm be jî, bikaranîna an gefa ambargoya gaz an petrolê ji aliyê welatên Kendavê ve hîn jî heye. Di heman demê de, Qatar dikare rêbazeke pragmatîktir ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê hilbijêre bi şêwirmendiya bi Dewletên Yekbûyî re û bi berdewamiya parastina wêneya xwe wekî ''forumeke aştiyane'' ji bo çareserkirina nakokiyan, ji ber hewldanên wê yên demdirêj ji bo parastina navûdengê xwe û nexwestina wê ya ji bo gurkirina bêtir. Di her rewşê de, ewlehiya ne tenê van welatan lê ya tevahiya herêmê dibe ku bi bersiva paşê ya Dohayê an jî bersiva kolektîf a welatên Konseya Hevkariyê ji bo Dewletên Erebî yên Kendavê ve girêdayî be, ku helwesta Qeterê li ser vê mijarê parve kirin û bi tevahî piştgirî dan biryara wê ya bersivdayîna li dijî êrîşa li ser paytexta Qeterê.

Konseya Hevkariya Kendavê (GCC) ji şeş dewletan pêk tê: Behrêyn, Qatar, Kuweyt, Îmaratên Yekbûyî yên Erebî (UAE), Oman û Erebistana Siûdî.

# Civîna 80 ya Netewên Yekbûyî

Divê navê vê rêxistinê Netewên Yekbûyî were guhertin. Jiber ku ev rêxistina Dewletên Yekbûyî ye, ne ya yekîtiya neteweyan e. Jiber ku ev rêxistin nûneriya netewan, gelan, civakan, baweriyan û hwd. nake



Ahmet Aktaş



Berî her tiştî divê navê vê rêxistinê were guhertin. Jiber ku ev rêxistina **Dewletên Yekbûyî** ye, ne ya yekîtiya neteweyan e.

Ya hêja, divê bi rastî bibe rêxistina **Netewên Yekbûyî**

Jiber ku ev rêxistin nûneriya netewan, gelan, civakan, baweriyan û hwd. nake. Belê, tenê nûnertiya dewletan dike, lewma berjewendiyên gelan naparêza belê ***berjewendiyên dewletan diparêze.***

Hema ji gelên cîhanê, bi tenê em bala xwe bidin nûnertiya du gelan; ma gelo di nava civînên vê rêxistinê de nûnerên **gelê Filistîn** û **gelê Kurdistanê** hat xuya kirin?

Ka em gelê Kurdistanê bidin rexekê, ma xwedêgiravî gelê Filistînê, ji aliyê piraniya wan dewletên ku beşdar bûne ve, weke dewlet jî hatiye pejirandin, lê dîsa nikaribûn nûnerê Filistîniyan **Mahmût Ebas** beşdarî civînê bikin!

Her wiha gelê Kurdistanê jî, êdî li cîhanê bi giranî hatiye naskirin û li parçeyê **Başûr** û **Rojava** weke federe an xweserî jî hatiye pejirandin ji aliyê gelek dewletan ve, lê nûnerê Kurdan jî nebû li civînê!

Ji bilî vê mijarê, qebhet û sosreteke din jî di vê zircivîna wan a herî bilind de hat dîtin, ev jî beşdar bûna kesên mîna **Colanî** bû! Ma gelo vî kesî parastina kê dikir, bi navê kê li civînê bû, nûneriya kîjan gelî dikir?

Divê, di serî de mirov zanibe ma kesayetiya vî kesî çi bû, da ku ji bo mirov zanibe li ser navê kê li wir bû?

Hema yekser diyar e ku ji aliyê dewletên herî giregir, di serî de bi pêşengiya DYEyê û dewletên Rojavayî(Ewropa) ve hatibû amadekirin, lê ji ber ku ti dewletên li dijî beşdariya wî derket in nehat dîtin, ev jî tê wateya ku ji aliyê hemû dewletên beşdar ve hat pejirandin!

Ev kesê bi navê **Mihemed Colaniyê** ku nuha bi navê **Ahmed Şara** tê nasîn û wisa tê pêşewazîkirin, di nava lîsteya rêxistinên terorist ên di asta cîhanî de tê nas kirin **DAIŞê** de cih standiye û di radeya cîgirê serokê wê **Ebubekir Bexdadî** de jî xebitiye.

Paşê weke şaxê vê rêxistina terorist, belê bi navê **HTŞ**ê derbasî Sûriyeyê bûye, niha jî tê zanîn li Şamê weke serokê vî welatî hatiye erkdarkirin.

Îca kesekî wisa xwedî pratik û kiryarê ewqas xwînrij, talanker, qirker û bi kurtayî dujminê mirovahiyê, bi taybetî dujminê jinê ye, gelo dikare çi jê were hêvî kirin, ma dikare weke nûnere gelê Sûriyeyê were naskirin?

Na xêr, ji xwe gotina 'hêvî kirin' şaş e, ya rast dibe ku ev be: kê ew anibe wira nûnerê wan e û êdî ew çi jê bixwazin Colaniyê wê bike!

Helbet van dewletên ku ew anîne civîna bilind a vê rêxistina NY ya ewqas xwedî navê mezin, dê karekî ji yê berê girantir û xerabtir jê bixwazin!

Yek ji armanca van hegemonên palpiştên wî, vî karê ewqas qirêj û qirker, bi navê **dînê islamê** pê didin kirin, da ku islamiyetê jî xerab bidin nîşandan e!

Heman karî bi rêveberiya niha Afganistanê jî dide kirin û dibe ku li hinek welatên din jî desthilatiyên dewletên bi vî navî bidin damezrandin û erkdarkirin.

Her wiha, mijareke xeter a din jî wisa diyar dibe ku, dixwazin xwediyê heman zihniyetê **Receb Erdogan** jî bike fermandar û koordinatorê vê tevgêra malxerab a Rojhilata Navîn.

Nîşanê vê tevgêr û projeya xerab, di hinek axaftin û danstandinên li gel **Receb, Colanî** û hinek qralên dewletên Ereban de jî dihatin dîtin!

Ev mijarek gelek giring, baldar, xeter û nû ye. Lewma divê haydarî, baldarî û amadekarî gelek bi berfirehî hebin li ser vê mijarê û tevgêrê.

Her wiha divê yên mîna **Colanî û Receb** jî, hinek mînakên wisa yên berê bînin bîra xwe ku van hegemonan, wan ji bo berjewendên xwe dajon ser tevgêrên azadiya gelan, piştî armancên wan pêkhat, çi anibûn serê wan hevalbendên xwe, dersan jê derxin!

Weke mînak **Şahê Îranê, Husnu Mubarekê Misrê** û hwd. çi hat serê wan an çi anîn serê wan? Aqûbeta vana, wê ji ya wan jî xerabtir be!

Li aliyê din, divê tevgêrên azadiya gelan û nûnerên wan, ji nûnerên van hegemonan bêhtir hişyar bin, hosta û amadekar bin, da ku karibin plan, proje û plangeriyên malxerab ên van hegemonên cîhanê vala derbixînin û karibin serkeftî bin.

Tu bala xwe didê devê nûnerên van hegemonan, gotinên mîna azadî û demokrasiyê li ser zimanên wan jî kêm nabe, lê helbet ji bo xapandinê!

Ma ne li ber çava ne, kî şerxwazan û teroristan diparêzin, aştîxwazan û azadîxwazan jî dikujin an dixin zîndanan?

Yên karên wan hemû kuştin, qirkirin, talan, tecavuz û kiryarên dijî mirovahyê nin yên mîna **Colanîyê** ku ji bo girtina wî **10 milyon** dolar hatibû terxan kirin çawa tên pêşewazî kirin, belê berovajî, yên li dijî şer in, aştîxwaz in, azadîxwaz in û nûnerên gelê xwe ne yên mîna **Rêber APO** jî di zîndanan de ne!

Îca divê herkes kumê xwe dayne ber xwe, şaşiyê jî û rastiyê jî bibîne û li gorî wê, hilbijartinên xwe bike.

Lê belê piştî vê hilbijartina xwe ku li aliyê rastiyê biryar dan, divê ranewestin, divê li gorî wê bijareya xwe tevbigerin û hîn bêhtir xwe bi rêxistin bikin!

Dermanê vê malxerabiyê ev e!

# Cînavk û Destpêka Ziman



Yaşar Eroglu

Cînavk, bi derketina holê ya ziman re hişkehişk girêdayî ne, çawa ku bi destpêka civakbûnê ve girêdayî be... Pêkhatina mirovahiyê û civakbûnê bi ked, ramandin û hêza afirandin, ango hişmendiyê re eleqedar e. Van hêmayan mirovahî aniye ba hev, têkiliyên civakî bi vî awayî derketine holê. Ziman jî encama van têkiliyan e. Yanî ziman ne hêmayeke çêkirî, îlahî ye, hêmayeke pêkhatî ye, qewimî ye. Kîngê mirov weke hêmayeke civakî derkete holê, pêşiyê afirandina amûrên debara xwe pêk anîn, nas kir, paşê xwe nas kir, pê re yên ku pê re ditêkilîn nas kirin.

Di setpêkê de navên mirovan ên taybet tune bûn. Piştî mulkiyetê, bi mirasa mulkiyeta taybet re navên taybet hatin dayîn da ku xwediyê mulkiyetê bê zanîn û naskirin. Navên mirovan, di destpêkê de bi hiqûqa mulkiyetê re yekser girêdayî ye. Heta niha di tu lêkolînên erdkolannasiyê (arkeolojik) yên li ser heyama neolîtîk û pêşiya neolîtîkê hatine kirin de, kesek li rastî navê mirovan ên taybet nehatiye dîtin ku bi hêmayên keşifkirî yan jî di bermayiyekê re hatibe pênasekirin, xêzkirin. Bi hêmayên ku weke baweriyê îşaret dikin re jî nehatine dîtin. Ji ber ku wê heyamê mulkiyet hevpar bû, nijada mirovan li gorî dayikan dihat naskirin, hewceyî bi navên taybet nebû. Hewceyiyeke xurt ji bo bikaranîna cînavkan hebû.

Bi têkiliyên mirovî-mirovahiyê re çi jin, çi mêr, yekser ji xwe re gotin 'ez', ên li hember xwe re gotin 'tu', yên dûrî xwe re gotin 'ew'; eger weke kom piranî bûna û bixwe jî tê de bûna jê re gotin 'em', piraniya yên nêzik ku xwe jî tê de nebûna jê re gotin 'hûn', piraniya ji dûrî xwe re jî dîsa gotin 'ew'. Weke mînak beriya Çaçan, Bedirxan ango navan cînavkên 'ez', 'tu', 'ew', 'em', 'hûn', 'ew' dihatin bikaranîn. Helbet eynî bi dirûvê îro nebûn, dibe ku bi demê re hinek guherîn, weke dirûvê îro girtin. Çi dirûv bibe bila bibe karîgerî-fonksiyona wan eynî ye. Yanî beriya navan, di destpêka mirovbûnê de cînavk hebûn, navên kesan ên taybet tune bûn. Daboriya cînavkan ew qas kevn ne, xwe digihîne destpêka bikaranîna ziman. Bi vê yeke îspat dibe ku eleqeya cînavkan, derketina wan a holê bi têkiliyên piştî derketina mulkiyetê re nîn e: Ne xwedayan, ne xwedavendan, ne jî têkiliyên wan bi deman re nîn e. Di heyama zimanên yekkiteyî de hatine bikaranîn, balkêş e ku hemû zimanên li pêş tên zanîn cînavk yekkiteyî ne. Navên cînavkan li gorî her erdnîgariyekê dirûv girtiye.

Ev gotar, bi nivîsa birêz Daxistan Payçû ya bi navê Cînavkên kurdî û wateya wan a dîrokî û civaknasî (Xwebûn- hejmar 301) re eleqedar derkete holê. Daxistan Payçû wiha dibêje, "Di mîtolojiyên Kurd û Arî de ji bo hebûnan (mirov jî) destpêkê jî hatiye bikaranîn. 'Azî' (di hin herêm û serdeman de dibe "Adî" jî) di heman demê de Stêrk e jî. Di bawerî û çandên asîmanî de Stêrk û ronahiya ku hatiye hebandin e jî. 'Êzî'yê ku di Êzidiyan de Xweda ye jî bi vê ve têkildar e." Payçû her şeş cînavk jî bi vî teşeyî şîrovekirine, wateyên cuda lê bar kirine. Her wiha her cînavkek li gorî hêmayên mitolojik, dayikbûn û hêmayên bi vî rengî rave kirine.

Di destpêkê de divê bê diyarkirin ku ev metodolojiyeke ne rast û ne zanistî ye. Mijara cînavkan mijareke zimannasiyê ye. Di qada etîmolojiyê de koka peyvan tê ajotin, guherînên wê yên li gorî heyaman tên şopandin. Lê ev şiroveya nivîskar ne etîmolojik e, zêdetir dişibe teşeyê îdeolojîk, ramanî û felsefî.

Werin em bi mantiqekî hêsan û nezanistî; yê rojane nêzî vê ravekirinê bibin û bipirsin. Pirsa pêşîn ev e, heta heyama xweda û xwedavendan mirovatiyê cînavk bi kar dianîn an na? Eger bi kar nedianîn, di dewsa cînavkan de çi bi kar dianîn? Gava yekî/ê bang li yê, ya din dikir gelo tenê îşaret bi kar dianîn? Eger cînavk bi kar anîbin ev angaşt an teza birêz Payçû tê çi wateyê?

Bi rastî em bikaranîn an jî destpêka cînavkan bi tezên ku Payçû, bi şeş xalan diyar kirine nikarin rave bikin. A wî destnîşan kiriye, texmînî sê-çar hezar salan vir ve ye cînavk derketine holê, di dîroka beriya wê de mirovîyê bi hezaran salan zimanê xwe bê cînavk pêşde biriye. Ma ev yek çawa dibe? Me şertên ku cînavk derxistine holê û bi ziman re eleqeya wan li jor diyar kir. Ne pêkan e ku mirov pênasekirina cînavkan mîtolojî, xweda, xwedavend û dayikbûnê ve girê bide. Ev yek ji sergêjiyê wêdetir tiştek nîn e. Veçirandina koka hin pêyvên weke teşe nêzî navên cînavkan belkî bi çav û guhan re xweş bên lê weke metodolojî tu tiştekî îfade nakin. Jixwe destpêka têkilîdanîna mirovahiyê vê rêbazê red dike. Mirovahî li gorî plan û projeyan pêş neketiye. Di hîmê pêşketina mirovahiyê de peresanek heye, diqewime û pêşî civatê, piştî ku civat weke civak dikemile, paşê civakê pê re pêş dixe. Têkiliyên mirovan û pêdiviyên rojane li mirovan ferz dikin ku ziman bi kar bînin, danûstandinan bikin, xîtabî hev bikin. Dema ku xîtap hebe, misoger cînavk jî heye. Li gorî hebûna heyî, mirov xwe û civata pê re dijî pênase dike; ez, tu, ew, em, hûn, ew bi vê têkiliyê re derdikevin qada ziman. Ev jî teqabulî hezar salên beriya heyama neolîtîkê dike.

Em her tiştî bi hêmayeke pîrozwer girê bidin, em ê tenê xwe bixapînin. Di dîrokê de hêmayên ku pîrozwer bên pênase û ravekirin hene. Lê mixabin her tişt bi vî teşeyî bê îfadekirin, wateya yên hewce jî kêm dike, heta bêwate dike. Ez vê rêbazê, bi taybet ji bo nivîskarê gotarê nabêjim. Mixabin ez dibînim ku ev rêbaz di gelek qadan de xwe nîşan dide. Ez nasandina pirtûkan ji bo projeya medyayê pêk tînim. Hevalên me yên vê rêbazê di wêjeyê-romanê de jî bi kar tînin hene. Bi niyeteke paqij hewl didin ku tiştinan, li gorî dîtina xwe bi teşeyên nû biafirînin. Lê çi, çawa û çima tê kirin metodolojiya wê nadin ber çavan, lêkolîn nakin, çawa lê tînin wisa dikin. Hin kes hene ku romana heyama neolîtîkê nivîsîne. Di wê heyamê de kesayetiya taybet nîn e, karakter nîn e, nav nîn e; ji ber wê jî ji bo romanan leheng nîn in. Yanî romana wê heyamê nabe, yan jî heke teqez roman bê nivîsandin, romana her kes pêzanê wê ye nîn e. Spartineke li heyamê ye, zordayîn e lê divê neyê jibîrkirin bi spartin û zordayînê nabe. Dîk hêk nake, ga nazê.

Em di gotara Daxistan Payçû de jî spartin û zordayîneke bi vî rengî dibînin. Wî weke misoger rave nekiriye, dibêje belkî wiha bibe. Her çend misoger nîşan nedabe, bernîqaş diyar kiribe jî ev metodolojî ne rast e. Di hişê wî de hêmayên felsefî û îdeolojîk; weke xwedavend, pîrozweriya jin û dayikan, heyama neolitik û girêdayîbûna wê bi kurdan re, hene. Mijara cînavkan pê ve girê dide. Lê girêdana vê mijara cînavkan, bi van hêmayan re ne guncav e. Eleqeya "Azî", "Adî", "dê", "da", "ca", "day" bi cînavkan re nîn e. Eger îleh mirov bixwaze eleqeyekê dayne, divê mirov çavkaniya "Azî", "Adî", "dê", "da", "ca", "day" bi cînavkan dayne, ne ku cînavkan bi wan re. Berî her tiştî cînavk hêma û diyardeyên dîrokî nîn in, hêmayên xwezayî yên ziman in. Li ser wan peresana etîmolojîk; çawa guheriye, waryantên wê çi, çawa ne û hwd dikare bê kirin lê bi vî teşeyî nabe.

Daxistan Payçû mijareke girîng girtiye dest, hewldaneke hêja ye. Mijarên li ser ziman her tim girîng in. Her çiqas hewldaneke hêja be jî divê aliyê wê yê metadodolojîk bê nirxandin, ji bo rast û teqezkirina rêbaz, metodolojiya rast û mijarên guncav hewceyî bi nirxandin û rexnekirina wê re heye. Ev gotar jî bi vê mebestê hate nivîsandin.



# Ver bi azadîye rayraşîyayîş

Şaro kurd rixmê heme sabotaj û kayan nê prosesî ra bawer keno û hêvîya xo berz a. Zano ke ewro yan siba dewleta tirke mecbur a ke gamêke bierzo. Nîjadperestîye êdî dewlete rê "derman" nîya. Yew rayîr est o, o zî demokrasî yo

Merkezê Xeberan





Komîsyono ke binê serbanê parlamentoyî de ronîya, kombîyayîşanê xo domneno. No hewte kombîyayîşo 12. virazîya. Serekê komîsyonî Numan Kurtulmuşî ard ziwan ke ê do nê kombîyayîşan ra dima dest pê pêşnîyazanê qanûnîyan bikerê. Bêguman hem serûberkerdişo qanûnî hem zî estîya komîsyonî semedê çareserkerdişê heme persan girîng ê. Ma eşkenê vajê ke tarîxê Komara Tirkîya de awanbîyayîşê parlamentoyî gamêka tewr şênber û muhîm a.

Seke zanîyeno awanbîyayîşê komare ra verî 10ê sibata 1922î de parlamento de derheqê otonomîya Kurdîstanî de pêşnîyaza qanûnî ameye nîqaşkerdene. Mîyanê na pêşnîyaza qanûnî de sernuşteyê sey "parlamentoyê şarî yê kurdan", "îdareyo otonom" û "wendegehan de musnayîşê ziwanê kurdî" est bîyî. Nê konteksî de parlamentoyê Tirkîya de raydayîşêk virazîya. Nê raydayîşî de 64 parlamenteran pêşnîyaza qanûnî rê nê vat, 373 parlamenteran zî tesdîq kerd. No raydayîş seba çareserîya persa kurdan xeylê avzel bî. 373 parlamenteran rîsk girewt, cîyakerîye nêkerde û nêfikrîya ke heqê ke kurdî genê destê xo Tirkîya lete kenê. Yanî înan de tersê parebîyayîş yan letebîyayîşî çin bî. 373 parlamenteran seba ke netewe û bawerîyî pîya biciwîyê, seba ke Tirkîya de cuya azad, têduşt û hempare bêro awankerdene raye daye. Netîce de waştişê înan nêame caardene û bi îlankerdişê komare heme hêvîyî vîndî bîyî û şîyî, la gamêka ke hetê înan ra erzîyaye seba atmosferê ewroyênî rayîr mojnena. Wa komîsyon gama 10ê Sibate çimdarîye bikero û ê eqlî xo rê sey rayberîye bihesibno. No eql ewro hema zî çin o. Ewro merdim çax keno ke sîyasetmedar yan îdarekaran de ters, tedemendîş yan zî kurdofobî est o. Seke Horatius nuseno "merdimo ke terseno, qetî azad nêbeno".

**Proses û sabotaj**

Mîyanê 2 aşman de komîsyonî 12 kombîyayîşî kerdî. Nê prosesî de 2-3 çîyan komel de tayê gumanî afernayî. Mîsal yew kombîyayîş de dayîka aştîye Nezahat Teke ard ke kurmancî qisey bikero, ci rê destûr nêdîya. Komîsyon eksê estîya xo têgêra. Xora armancê nê prosesî azadbîyayîşê ziwanê kurdî yo. Komîsyon bi no armanc ronîya. La ey kurmancî qedexe kerd û mîyanê komelî de şik aferna. Xora komelê Kurdîstanî de hertim tayê gumanî est bîyî. Komîsyonî şaşîye kerde û hişmendîya şarî kerd têmîyan. Mîyanê nê di aşman de çîyo ke hişê şarî de ca girewt, Îzmîr de qewimîyabî. Komela Cigêyayîşî ya Ziwan û Kulturî ya Awesta bi fermanê walîyîye ame qefilnayene. Seke zanîyeno walîyîye girêdayîyê Wezaretê Karanê Zerreyî ya û goreyê talîmatanê wezaretî têgêrena. Na çarçewa de hukmat mesuldarê nê kerdişî yo. Hetêk ra komîsyon xebatanê "demokratikbîyayîşî" domneno, hetekê bînî ra hukmat bi talîmatanê xo nê prosesî "sabote" keno. Wina aseno ke Walîyîya Îzmîrî saboteker a. Çike nê gamî hem zerar danê prosesî hem zî bawerîya komelî şiknenê.

**Demokrasîyo radîkal**

Şaro kurd rixmê heme sabotaj û kayan nê prosesî ra bawer keno û hêvîya xo berz a. Zano ke ewro yan siba dewleta tirke mecbur a ke gamêke bierzo. Nîjadperestîye û yewperestîye êdî dewlete rê "derman" nîyî. Netewe-dewlete êdî zana ke heta ke reforman nêkero û gamanê demokratîkan nêerzo estîya xo nêeşkena bidomno. Êdî otokrasî xeripîya û waştişanê komelî rê cewab nîyo. Yew rayîr est o, o zî demokrasîyo radîkal o.




## Cinîyê wanijî agêrenê

Cinîyê wanijî sey her serre emser zî qantiran ser o şîyî zozanan û xeylêk zehmetîye ante. Hamnan qedîya û seba înan dem demê agêrayîşî yo.

Herêma Serhedî ya Kurdîstanî hetê heywankarî ra xeylê balkêş a. Bi taybetî hamnanan de cinîyî wareyan de zaf zehmetîye anjenê. Hema-hema 4 aşmî na zehmetîye domîyena. Emser zî cinîyanê qezaya Mîksî ya Wanî 4 aşmî kedêka pîle daye û nika agêrenê.


***Cinîyê Mîksî***

Qedîyayîşê hamnan reyde rojê peyênî yê rayîrê zozanan ê bêrîwanan (cinîyê ke şonê şit doşenê), de emser zî cinîyan zî kedêka girse daye. Serê sibayî şefeqî wirzîyenê, yan bi wesaîtan yan zî pê qantiran bi kîlometreyan şonê resenê zozanî û mîyanê xo doşenê. Cinîyî şit û penîro ke virazenê, pê debara xo kenê. Bahçesaray (Miks) ke dûrîya ci ra her kesî vanê rojgêra 9., cinîyî hamnan bêrîwanîye kenê, zimistan keyeyan de heywananê xo ra ewnîyenê. Dewa Arincê de cinîyî teqrîben 4 aşmî rayîrê 2 saetan pê qantiran yan estoran şonê zozan. Cinîyê ke her roje nê rayîrê talukeyinî ra şonê mîyanê xo doşenê, sibayî vejîyenê şan agêrenê keyeyî. Cinîyî vanê: "Seba debare ma xebitîyenê. Tîya de karêko bîn çin o."

***Vatişê Qiymet Çagircî***

Nehyaya ke zimistanê ci zaf çetin o, rayîrê bêrîwanan wisarî dima şîyayîşê zozanî hem vewre hem zî varayîşan ra tim xirab beno. Seba rayîrê nêviraşteyî her serre eynî probleman ciwîyenê û 2 saetî rayîrî bi qantiran şonê. Seba vayîya sotemenî zî nêeşkenê wesayîtêk bigîrê. Cinîyê ke mîyanê roje de zaf betilîyenê, karê xo qedênenê û dima seba şit û penîrî mecbur manenê agêrê keyeyê xo.

Rayîrê zozanî de pêdîyayîşê cinîyan de Qiymet Çagircî wina vat: "20 serrî yo ez nê karî kena. Bi serran o yan bi estoran yan zî qantiran ma şonê bêrîyî (karê dotişê pezî). Mîyanê xo doşenê, penîrê xo virazenê, reyna yenê keye. Mecburî ma nê karî kenê. Tîya karêko bîn çin o. Ez teqrîben 20 serrî yo nê karî kena. Domanê ma keye de tenê manenê, ma yenê keye na rey zî karê keyeyî kenê. No rayîr her zimistan xirab beno. Vewre yena, varan yeno xirab beno, wesayîtî reyde ma nêeşkenê şêrê. Serê sibayî 10 de ma şonê, şan 7 de reyna yenê dewe. Rayîrê ma teqrîben 2 saetî ramîno. Gulane de na raywanîye dest pêkena, peynîya êlule de qedîyena. Pêro berhemê xo yê zimistanî ma bêrîyî ra temîn kenê. Kede danê ke zimistan rehetêr vîyaro."



# Maddeyê hişbirî û asîmîlasyon



Mihemed Kurdî

Roca ma ya ewroyêne de tersê famîleyan o tewr pîl tîryakîyîya maddeyanê hişbirî ya. Kurdîstan de zî seke heme welatanê bînî yê dinya de hûmara kesanê ke bîyê tîryakîyê maddeyanê hişbirî roc bi roc vêşî bena û çi heyfo emrê kesanê ke nê maddeyan şixulnenê zî heta 12 serreyan kewto. Enê zî pîlbîyayîşê xetero ke ma tede yê mojnenê.

Komelê ma bikarardişê maddeyanê hişbirî enê serranê peyênan de bi awayêko zelal yeno vînayîş. Bi arizî zafaneyê kesanê ke kewtê nê belayî tût û ciwanî yê. Hetê pisporan ra yeno texminkerdiş, eke vernîya ci (tîryakîyîya maddeyan) nêna girewtiş, ameyox de eno xeter do pîlêr bibo û bireso daraxêkê zaf xeternakî. Aye semed ra ma eşkenê vajê ewro xeterê komelê ma yo tewr pîl tîryakîyîya maddeyan a.

Bêguman zaf semedê tîryakîyîya maddeyan ê psîkolojîk, komelkî û bîyolojîkî est ê, la welatê ma de semedo tewr pîl ekonomî ya. Seke şima zî zanenê Tirkîya û vakurê Kurdîstanî de bêkarîye resayo daraxêkê zaf pîlî. Û reyna krîzê îqtîsadî ver şertanê cuye zaf zahmet bîyê û êdî şar nêeşkeno îdareyê xo bikero. Ena ray tût û ciwanê ke nêeşkenê hewcedarîyanê xo yê bingeyinan peyda bikerê, kewenê mîyanê stresî û cuye ra serdin benê. Xapênayîşê merdimanê ke hetê psîkolojîk de nêweş ê, zaf asan o, xora têcîrê karî (maddeyê hişbirî) zî seba ke malê xo biroşê gêyrenê merdimanê winasîyan. Semedêko bîn o pîl zî oyo ke ewro welatê ma de vînayîş û bidestviştişê maddeyanê hişbirî zaf asan o. Bi arizî serê her taxe û kuçeyê bajaranê pîlan de enê maddeyî yenê rotiş, enê benê semed ke nê nêweşîyê komelkî (tîryakîyîya maddeyan) yê ameyoxê ma tehdîd kenê bi awayêko asan mîyanê şarî de vila bibê. Reyn persê mîyanê malbat û dorûver û embaztîye xeletî zî semedê bînî yê pêrabestbîyayê maddeyanê hişbirî yê.

Tenê Kurdîstan de nê heme dinya de insuro tewr pîl o ke komelî tehdîd keno tîryakîyîya maddeyan a. Bikarardişê maddeyan, merdiman cuye ra serdin kenê û komelî ra dûr fînenê. Merdimê ke kewenê nê belayî heme xuyanê xo yê verê yê asayîyan/normalan veradanê û têkilîya xo keye, embaz û merdiman ra birnenê. Eno beno semedê vilabîyayîşê malbat û xerabîya komelî. Reyna tîryakîyîya maddeyan, komelan de beno semedê zaf bîyayîşê suçan û înewa tîryakîyîya vêşî zî bena semedê nêweşî û xokiştişan. Bi kilmekî bikarardişê maddeyanê hişbirî tenya cuya xebitnayoxan denêkeno mîyanê xeterî, qandê coy yê komelî zî dekeno mîyanê xeterî.

Dagirkerdoxê Kurdîstanî semedo ke ciwananê kurdan dewaya kurdî ra dûr bifinê, zaf rayîr û metodê asîmîlasyonî ceribnenê. Enê serranê peyênan de vakurê Kurdîstanî de bi awayêko zelal vilakerdişê maddeyanê hişbirî yeno vînayîş, bi arizî zî bajarê sey Amed, Wan, Riha û Mêrdîn bîyê halînê maddeyanê hişbirî. Raşta ci mumkin nîyo ke vilakerdişê enê maddeyan bê hayîya dewlete bibo, çimkî gama ke kurdêkê ma duştê dewlete de rexneyêkê qijî bikero, yan zî ma vajê eke seba heqê beşdarê mîtingêkî bibo dewlete hema ca de ey/aye desteser kena û erzena zerre. La dewlete heto bîn de çimê xo merdimanê ke maddeyanê hişbirî roşenê ra ginê, yan zî ma vajê eke bigêro zî dima înan ra yew efû vejeno û înan veradanê. Enê zî mojnenê ke maddeyê hişbirî zî polîtîkayanê şerê arizî yanê dewlete ra yew o û ena polîtîka binê qayîdê dewlete de û bi awayêko plankerde yena kerdene/caardişê. Xora ma rew ra zanenê ke, "Ti se kenî, biko la sîyasetî ra dûr şino." Polîtîkaya înan a.

Tût û ciwanî ameyoxê welatêkî yê, ena ray dewlete seba ke ameyoxê welatê ma (tût û ciwanî) dewa ya kurdî û hişmendîya neteweyî ra dûr bifino, înan teşwîqê maddeyanê hişbirî kena. Dewleta Tirkîya estbîyayîşê kurdan xora seke gef vînena, ena ray dewlete seba ke tût û ciwananê kurdan bênasname, bêhêz û zeîf bikero, polîtîkayanê sîstematîkan ê sey maddeyanê hişbirî ca anê. Zaf cayanê vakurê Kurdîstanî de ameyo vînayîş ke vilakerdişê nê maddeyan bi destê dewlete yeno organîzekerdiş. Dewlete wazena bi no qayde vernîya rêxistinbîyayîşê ciwananê kurdan bigêro, înan bêtifaq û lete bikero.

Roca ma ya ewroyêne de persê komelê Kurdîstanî yo tewr pîl û xeternak tîryakîyîya maddeyanê hişbirî ya. Çi heyfo zaf keyna û xortê ma yê erjayeyî bîyê qurbanê nê nêweşîyanê xeternakan; zaf malbatê ma bîyê vila û ocaxê zaf keyeyanê ma kor bîyê nê nêweşîyan ver.

Meseleyê maddeyanê hişbirî persêka komelî û sîyasî ya, çimkî ê tût û ciwanê ke bîyê qurbanê nê nêweşîyan, yê ma kurdan heminan bîyê. Aye semed ra ganî sîyaset, çapemenîye, partî, komele, rêxistin, dezgeh û heme dînamîkê Kurdîstanî yê bînî pêro pîya bixebitê û vernîya nê xeterî bigêrê.

Raşta ci nê warî de baroyê ma yê kurdî karê zaf erjayeyî kenê, bi arizî zî baroyê Amedî heta nika nê meseleyan ser o zaf raporî hedre kerdê, konferansî dayî û sewbîna xebatê zaf erjayeyî kerde. Seba nê hessasîyetî ma baroyanê xo rê zaf sipas kenê. Reyna ganî ma bivajê ke şaredarîyê ma yê kurdî zî nê dehkerayan ser o zaf xebitênî û heta nika nê warî de zaf bername, konferansî, meşî û mîtingî viraştê û xeterî ser o komelê ma hişyar û hayîdar kerdê.

Her çend vera nê perse û nêweşîyanê xeternakan (tîryakîyîya maddeyan) biney cehd û xebatî bibê la ancî zî kemî yê. Ganî ma heme berpirsîyarîya xo bizanê, tût û ciwananê ke kewtê nê rayîrê xeletî rê bibê paştî û seba ke înan şar û welatê xo rê bibê ferdê başî ma hetê înan bikerê.

Seba ke şar, komel û welatê ma cira xelas bibî, ganî no mesele (maddeyê hişbirî) zî sey dewaya azadîya welatî bêro vînayîş, coka ra ganî cehdo ke vera nê nêweşîyan yeno kerdene zî sey yê xelasa welatî bêro vînayîş.

Jawad Morad



# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

**1-** Tiştek min heye
Ne gur dixwe û ne diz dibe
Ew çi ye?

**2-** Pênc pênc in
Xwişk û biran e
Hertim bi te re ne
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***

**1-** sî/sîber **2**-Tîrêjên destan

# Zêr dide zirandin

**Abdullah Ongullu**

Rojekê Hecî Yaşar diçe bajarê Sêrtê. Ew bi xwe ticar e. Lê dinêre li ber dikanekê zarokek rûniştiye û zêrek di destê wî de ye. Wextê nîvro ye, kes jî li derdorê tune ye. Ji bo gumana di serê xwe de jê bibe baş lê dinêre. Rast e, zêr e. Diçe rex zarok û jê re dibêje:

"Kuro, wî tişê zerik ê di destê xwe de bide min ez ê şekir bidim te."

Kurik di cî de radibe şipiya û bi baldarî li Hecî dinêre.

Dibêje: "Baş e Mamê Hecî, ez ê vî tiştê zerik bidim te lê bi şertekî."


"Çi ye şertê te birazî?"

"Ez gelekî ji dengê zirîna keran hez dikim. Ger tu sê caran wekî kerekî bizirî ez ê bidim te."


Hecî Yaşar li kolanan mêze dike. Kesekî wî bibîne tune ye. Destê xwe dide ber devê xwe û sê caran wekî keran dizire. Ji zarok re dibêje: "De bide."

Zarok jê dûr dikeve û dibêje:

"Mamê Hecî, tu ker î tu dizanî ev zêr e, ma ez çawa nizanim?"



# XAÇEPIRS



## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

***3-*** Sewaleke bargiran ***5-*** Cînavkeke yekjimar ***7-*** alaveke kevnar ya ji bo ronîkirinê ***8-*** Hewa ***9-*** Şref, hêjatî ***13-*** Gulî ***14-*** Yekeyeke pîvanê ***16-*** Fêkiyek ***19-*** Rizgarî (bi kirmanckî) ***20-*** Bersiva neyênî ***21-*** parî ***22-*** Hêsîr ***25-*** daçekek ***26-*** Wesayit, otomobîl, tirimbêl ***28-*** Dengbêjekî kurd yê bi nav û deng (……..Axa)

## JI JOR BER BI JÊR VE

***1-*** Zordar (bi kirmanckî)
***2-*** Bajarekî rojhilatê Kurdistanê
***3-*** Pûşê hêrayî
***4-*** Tazî
***6-*** Semboleke şoreşa Kobanê, jineke şoreşger
***10-*** Şaşwaz (bi kirmanckî)
***11-*** Tawanbarî , tawan (bi kirmanckî)
***12-*** Daxwaz, armanc
***15-*** Roja piştî îro (bi kirmanckî)
***17-*** Melkes, gezik (bi kirmanckî)
***18-*** Qeyik
***20-*** Ne tijî
***23-*** Hêlîn
***24-*** Ga dimire çerm dimîne, mirov dimire( …….) dimîne
***27-*** Tûj

## Bersiva hefteya borî





Fatma Taşli Tunç

# Mewlûda Xalojna Hûtê

Di nava gelê kurd de, gelek kevneşopî û çandên curbecur hene, danîna mewlûdê jî yek ji wan çanda ye ku ji xwe re kiribûn weke kevneşopiyekê û di her malbatê de mewlûd dihate xwendin. Xelkê çav li hev dikirin ku malekê mewlûd bida, dibû sibe, cîranê wan jî haziriya mewlûdê dikir. Vêya ji xwe re kiribûn weke çandeke olî.

Rojekê cîraneke me mewlûd danîbû û bang li der û cîranan kiribû, tev li hev civandibûn.

Xwarin, vexwarin û şekir û şerbeta ber mewlûdê amade kiribû li kelecan li hêviya Seyda bû ku were mewlûdê bixwîne.

Satilek tije şerbeta sor kiribûn. Ser sêniyeke mezin tije gofret û piskevît û loqim kiribûn. Şaleke rengîn avêtibûn ser sêniyê û tev li bendê bûn ku seatekê berî seatekê mewlûd were xwendin û ew jî devê xwe şêrîn bikin.

Lê jina ku wê mewlûd ê bixwîne li ortê tunebû. Bi seatan sekinîn Meleya me nehat.

Çavê her kesî li sêniya şêraniyê bû lê hetanî mewlûd neyê xwendin û dua neyên kirin, divê kes desmalê raneke û tiştekî nexwe.

Hema carekê ji nav koma jinan dengek bilind bû, dengê Xalojna Hutê,

--- Ka yadê Ka bînin ez bixwînim wîîî.

Jina li çavê hev nihêrîn û li Xalojna Hûtê nihêrîn.

Xwediya malê got; ma tu dizanî bixwînî xweha min?

Hûtê got; ê de qey em ê îdare bikin lêê.

Wele Xalojna Hûtê rabû destmêj girt û li serê quncik rûnişt û dest bi xwendina mewlûdê kir.

'Em bikin hemdê xuda ê alemîn
Ew xudayê daye me dînê mûbîn
Em kirine umeta xeyrul beşer tabihê wê mibte-dayê namûwer'

--Bila mewlûda we serê we bixwe ,we em îro ji birçîna kuştine.

Merheba û merheba û merheba û merheba
Merheba û merheba û merheba û merheba.
Seydo Bûbo, Kemal kero, merheba.
Merhaba û merheba û merheba
Seydo Bûbo Kemal kero merheba.
Ka dê îro kîngê mewlûd biqede.
Tê parîkek jahra bavê xwe bi me dî.

Xalojna Hutê ji xeynî mewlûdê çi tê devê wê dibêje.

Hema jinek ji nava civatê radibe û diqîre.

--- Hê û hê û hê û hê û hê û hê û hê Alah hê .

Û dengê hê û selewata dengê Xalojna Hutê dibire û deng li nav hev dikevin.

Paşê radibin nanê xwe dixwin,yek dibêje Xalojna Hûtê,

-- Keçê ma qey te zanibû mewlûd bixwenda? Weleh de min idare dikir.

Car din dipirse, keçê ma Seydo Bûbo Kemal ne zarokê tene?


---Erê weleh û kero jî bavê wan e.

-- Keçê ma te navê zarokê xwe digot?


Erê

Ma ne ez bûma hûnê îro ji birçîna bixewiriyana.

Û êdî kî bang min bike, ez ê herim mewlûda wan bixwînim.



# ‘Aryenên çavşîn û porzer ji Ewropayê derketin!’



Rohat Bulut

**Profesorê paleocografya û arkeolojiyê Pavel Dolukhanov, dîroknas û arkeolog Colîn Renfrew, zimannas û akademisyen Tamaz Valerianis dze Gamkrelidze û V. Ivanov bi lêkolînên xwe şewqê didin li ser çand û zimanê Aryenî û Hînd-Ewropî. Li ser “Aryanên çavşîn û porzer ji Ewropayê derketin!” çi dibêjin?**

Me di nivîsa xwe ya beriya vê ya li ser dîroka çandê behsa çanda Arî û guherîna wê ya di dîrokê de kiribû. Em mijara xwe ya li ser dîroka çandê li gorî xebatên lêkolînî û derfetan berdewam dikin û pê dadikevin. Guherînên di çand û ziman de çawa pêş dikevin? Çi dibe sedema guherînan û lazim e ku mirov li pêşberî vê yekê çawa tevbigere? Çawa bi çi daneyan xwe bigihîne encama rast an jî ya herî nêzî rastiyê? Di encama xebatan de xuya, aşkere û qebûla giştî ye ku ziman û çanda Arî di serdama Şoreşa Neolîtîkê de pêş ketiye û bi demê re belav bûye. Wekî erdnîgarî jî Kurdistana îro ji vê şoreşê re dergûşî kiriye. Lê bi demê re hema bêje li seranserê cîhanê belav bûye.

Çand û zimanê Arî li Rojhilata Navîn, Ewropa, Asya û Hindistanê belev bûne. Hin zanist û derdor, çand û zimanê kurdî (Aryenî) wekî zimanê Hind-Ewropî nîşan didin. Aliyê xwe yê rast heye lê berovajî nîşan didin. Dema vê yekê angaşt dikin, mînaka herikîna ava çemekî ya ji çavkaniyê û ber bi xweşherikînê ve tê ber çavên mirov. Gelo çiqas pêkan e ku ava çemekî ku serberjêr diherike ber bi jor ve bigerik e? Li aliyê din ispata zanistî ye ku kokên çand û zimanê Aryenî Kevana Zêrîn e.

Di vê çarçoveyê de, pêdivî ye ku xaleke din ku dîroknivîsiya Ewropî tahrîf kiriye were zelalkirin. Çavkaniyên Ewro-navendî angaşt dikin ku navenda ziman û çanda Arî Ewropa bû; ji wir, di dora 2 hezar sal beriya mîladê de di nav bakurê Ewropa û Rûsyayê re, di nav Qefqasyayê re, derbasî Rojhilata Navîn bû û li Anatoliya û Hindistanê belav bû. Lêbelê, îro, daneyên zanistî yên zelal tam, berovajî vê angaştê îspat kirine. Di dîrokê de wekî pêla berfirehbûna Arî tê zanîn, ew li Rojhilata Navîn derketiye holê û ber bi Ewropayê ve herikiye, şoreşeke çandî çêkiriye ku Ewropa hejandiye. Aşkere ye ku ev pêla şoreşê bi şopandina rêyeke di nav Anatoliya, Trakya, Balkanan û her weha di nav bejahiya başûrê Rûsyayê re gihîştiye Ewropayê. Bi vî rengî, beriya zayînê bi 4-5 hezar salan, hema hema tevahiya Ewropayê şoreşa çandiniyê ya Neolîtîkê belav bûye. Di dîrokê de, ev berfirehbûn wekî pêla Hind-Ewropî ya bi eslê xwe Arî hatiye binavkirin.

**Gotinên Colîn Renfrew li ser Aryen**

Di vî warî de gelek zanyarên Ewropî bi xwe jî angaşt dikin ku çavkaniya sereke ya çand û zimanê Aryen ne li Ewropa, li Rojhilata Navîn derketiye holê û li seranserê Ewropa û Ewrasyayê belav bûye. Colîn Renfrewê navdar ê Brîtanî ku di warê dîroknasî, radyokarbon, arkeogenetîk û arkeolojiyê de zanyarekî pispor bû, ku li Zanîngeha Cambridgeyê yek ji Profesorê Disney Arkeolojiyê bû û damezrînerê Enstîtuya Arkeolojiyê ya McDonald bû li ser vê mijarê xebatên girîng raxistiye ber çavan. Colîn Renfrew di lêkolîna xwe ya 1988an de “Arkeolojî û Ziman: Sirra Orijîna Hind-Ewropî”, li ser bingeha vedîtinên arkeolojîk dibêje ku “cotkarên pêşîn li beşa bakurê Kevana Zêrîn, li Rojhilatê Anatolyayê (Erdnîgariya Kurdistan) bi cih bibûn, bi şêweyekî zû yê Hind-Ewropî diaxivîn.”




**Işaretê bi Kurdistanê dikin**

Dîsa zimannas û akademîsyenê gurcî Tamaz Valerianis dze Gamkrelidze ku Hîtîtolojîst û akademîsyenekî ku bi xebatên xwe yên di zimannasiya Hind-Ewropî, zimanên kevnar û Kartvelolojiyê de dihat nasîn jî li ser çand û zimanê Arî, wekî erdnîgarî işaretê bi Kurdistanê dikin. Dîsa zanisit û lêkolînerê navdar V. Ivanov jî di nivîsên xwe de yên li ser çand û zimanê Arî ku wekî berhema Şoreşa Çandiniyê ya Neolîtîk pênase dikin, wekî erdnîgarî jî işaretê bi Kurdistanê dikin.

**Pavel Dolukhanov çi dibêje?**

Doktorê zanistên erdnîgariyê, profesorê paleocografya û arkeolojiyê Pavel Dolukhanov jî teqez dike ku cih û derketina çand û zimanê Aryenî erdnîgariya Kevana Zêrîn e û ji vê derê berbelav bûye. Her wiha Pavel Dolukhanov, balê dikişîne ser peyvên wekhev û hevpar ên di zimanên Hind-Ewropî û Aryenî de, amûr û berhemên çandiniyê, hin ji heywanên kedîkirî yên pêşîn. Ev bêguman yek ji nîşaneyên girîng ên têkiliya di navbera ziman û çanda Aryen û nirx û serdema Neolîtîkê de ye. Divê were zanîn ku gelek ji peyvên ku di zimanên Ewropî de hene di kurdî de jî hene û îro jî di zimanê rojane de bi berfirehî têne bikar anîn.

**Li ser mijarê gotinên Abdullah Ocalan**

Li ser vê mijarê û wekî civak jî pê bawer Rêber Abdullah Ocalan jî van tiştan dibêje: “Ev kevneşopiya herî girîng a dîrokê, ku em dikarin jê re bibêjin koma ziman û çanda Aryen, bi berhevdanên arkeolojîk, etîmolojîk û etnolojîk bi hêsanî hate îspat kirin ku di vê çavkaniya sereke (Kevana Zêrîn) de ji dora sala 11,000 BZ ve şikil girtiye. Bi taybetî, gelek peyvên ji wê serdemê û hîn jî di zaravayên kurdî yên li herêmê de têne bikar anîn nîşan didin ku çavkanî di vê serdemê û di wê demê de hatiye avakirin. Ziman û çanda Aryen bi eslê xwe berhemên şoreşa çandinî û sewalkariyê ne. Hemû deverên ku ev şoreş lê belav bûye bi piranî bi zimanên ku ji vê eslê hatine diaxivin. Tenê îstîsna koma zimanê Semîtîk in, ku ji çolê derketine, û komên zimanê Fîn-Ural-Mongolî, ku ji deverên qeşayî derketine.”

**“Aryanên çavşîn û porzer”**

Yanê ew tez û angaştên ku “koma ziman û çanda Hind-Ewropî ji deştên Ewropa û Rûsyayê gihîştiye başûrê Rojhilata Navîn”, ji aliyê zanist û şîrovekarên dîroknas ve hatine pûçkirin û dîroknas didin xuyakirin ku ji erdnîgariya Kevana Zêrîn ev çand û ziman belavî wan deran bûye. Ev niha rastiyeke dîrokî ya bi tevahî ispatkirî ye. “Aryanên çavşîn û porzer ku ji Ewropayê derketin, beriya zayînê bi 2 hezar salî ber bi platoyên bakurê Îranê ve çûn û ji wir jî ber bi Hindistan, Medya û Anatoliyayê ve çûn.” Ev nêzikatî bi bingehîn xelet e û nêrîneke nijadperest e ku ji bo armancên berfirehkirinê yên faşîzma Alman wekî amûrekî xizmet kiriye. Rastî berevajî û cuda ye.

**Rastiya dîroka çandî**

Encama dîrokî ev e ku welatê ziman û çanda Aryen Kevana Zêrîn ango Kurdistan e. Eşîr û gelên ku wan afirandine û afirînerên Neolîtîkê bi xwe jî pêşiyên kurdan bûn. Ev rastiyek e ku bêguman cihê reng û beşdariya kurdî di dîroka çand û şaristaniya gerdûnî de bêtir xurt dike.

## Heftenameya Nûçeyên Çandî



Servîsa Çandê

***Mîrateya çandî li ber tinebûnê ye!***

Herêma Hewramanê yek ji deverên geştyarî û çandî ya dîrokî ya Başûrê Kurdistanê ye. Ji aliye çand, huner û nasnameyê ve navçeyeke cuda ye. Yek ji taybetmendiya xwe ya herî berbiçav û balkêş xwedî çandeke dewlemend e. Ji ber xemsarî û nêzîkatiya Hikûmeta Demborî ya Herêma Kurdistanê ev çand li ber xeteriya tunebûnê ye. Hewramanî dibêjin hikûmet bi qasî pêwîst dike di parastina ve mîratê de bi berpirsyar tevnagere.

***Li Kerkûkê pêşengeha pirtûkan***


Bi beşdarbûna 80 weşanxane û navendên çand û hunerê, li bajarê Kerkûkê 1emîn Pêşengeha Pirtûkan a Navneteweyî hat vekirin. Pêşengeh dê heta 2yê cotmehê vekirî bimîne. Waliyê parêzgeha Kerkûkê Rêbwar Teha di vekirina pêşengehê de axivî û wiha got: “Kerkûk di warê çand û hunerê de bajarekî têr û tijeye. Li Irakê 5 bajar di warê rewşenbîriyê de tên nasîn ku yek ji wan Kerkûk e.”

***Belgefîlma “Destên Terikî”***

Navenda Yekpar ya ku xebatên çand û hunerê dimeşîne, bi desteka Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyeyê der barê 11 kesên ku li bajarê Qamişlo di xebatên huner, xizmetguzarî, ewlekarî û perwerdeyê de cih digirin, lê nayên dîtin, xebatek da destpêkirin. Xebata bi navê “Rêzdariya keda bêdeng” di 7ê tîrmeha 2025an de hatiye destpêkirin. Di çarçoveya xebatê de 11 kesên hatine diyarkirin û li gorî plansaziya hatiye derxistin, li ser jiyana heman kesan, karên wan ên rojane, daxwaz, nerîn û xeyalên wan de, belgefîlmeke bi navê “Destên Terikî” tê amadekirin.

***Fîlmê ‘Heval Birako’***

Komîna Fîlman a Rojava çîroka ku rojnameger Nazim Daştan qala wê kiribû, bi navê “Heval Birako” kir fîlm û diyarî Nazim Daştan kir. Derhêneriya fîlmê Nûman Yigît kir. Çîroka fîlmê ji aliyê Nazim Daştan ve hatibû amedekirin û Onder Çakar jî çîrok veguherand senaryoyê. Kişandina fîlmê di 7ê Tebaxa 2024an de dest pê kiribû û di 7ê Cotmeha 2024an de bi dawî bibû. Beriya wê jî mehekî amedekariya kişandinê hatibû kirin. Dema fîlmê demjimêrek û 53 deqe ye.



## Ferheng

## Krîtîsîzm

**Kritisizm doktrîna fîlozofê Alman Immanuel Kant e. Li gorî Kant, lêpirsîna felsefî divê nirxandinek be. Felsefe bi rêya aqil tê meşandin. Ji ber vê yekê, ji bo nirxandina aqil, divê mirov bi tevahî fêm bike ka ew çi ye û çi nîn e. Bi çi celeb aqil felsefe tê meşandin? Bi aqilê paqij, aqilekî paqij ku ezmûnê bikar nayne. Ji ber vê yekê, aqilê paqij çi ye? Aqilê paqij angaşt dike ku zanîna pêk tîne ku ji daneyên hestiyariyê nayê wergirtin. Ev tê wateya asta tiştên ji rêzê derbas dike û digihêje asta ramanê. Ji ber vê yekê, rêbaza zanînê ya aqilê paqij rêbazeke derbasbûnê ye. Gelo aqilê paqij dikare bi vê rêbazê bigihêje zanîna rastîn? Wê demê, zanîn tê çi wateyê? Pêwîst e zanist jî were pênasekirin. Li gorî Kant, hemî zanîn darizandinek e.**

**Lêbelê, her darizandin ne zanîn e. Bo nimûne, daraza “her tişt cîh digire” agahiyên nû nade me, ji ber ku têgeha “tişt” di bingeha xwe de “girtina cîh” dihewîne. Di vê darazê de, tenê analîzek tê kirin û bi analîzkirina têgeha “tişt”, agahiyên di hundirê wê de bêyî hewcedariyê ji nû ve têne komkirin. Lêbelê, daraza “ev bar giran e” agahiyên nû dide me, ji ber ku têgeha “bar” bixweber nîşan nade ka ew sivik e an giran e. Li vir, berevajî yên din, em ne analîzekê, sentezekê pêk tînin û bi hevgirtina têgehên “bar” û “giran”, em agahiyên nû bi dest dixin. Ji ber vê yekê, darazên ku agahdariyê didin me ne darazên analîtîk in, darazên sentetîk in. Ma aqilê paqij dikare vê darza sentetîk bi derbaskirina ezmûnê, bi karanîna rêbaza derbasbûnê pêk bîne?**

**Kant bi awayekî teqez bersiva vê pirsê dide û dibêje “nikare.” Bi vî awayî, ew metafizîkê bi awayekî teqez hildiweşîne: “Aqlê paqij bêyî ku ji ezmûnê sûd werbigire nikare tu zanînê pêk bîne.”**

**Kant rexneya xwe didomîne: çima aqilê paqij nikare zanînê pêk bîne, ku ew darizandina sentetîk e? Ji ber ku aqil tenê karekî yekbûnê dike û materyalên pêwîst ji bo vê peywirê ji rêza tiştan derdixe. Dema ku em kevirê ku di destê xwe de digirin berdidin, em dibînin ku ew dikeve û wê demê em zanîna ku “kevirê ku tê berdan dikeve” bi dest dixin. Berî vê ezmûnê, tu zanîna me ya vê yekê tune. Hest van materyalan dide me. Hest çawa van materyalan dide me? Ew wan di nav dem û mekanê de dide me.**

**Lêbelê, di rêza tiştan de, tiştek wekî dem û cîh tune. Ji ber vê yekê, ev tişt in ku hesasiyet ji derve wernagire, lê ji xwe distîne û hesasiyet nikare bêyî ku wan têxe nav xwe tiştek ji derve werbigire ji me re bişîne. Ji ber ku ev bi rêya ezmûnê nayên bidestxistin, gelo ew daneyên aqil in? Kant bersiva vê pirsê dide û bi tundî dibêje: “na, ew nikarin daneyên aqil bin.” Ji ber ku zarokên piçûk bêyî ku bifikirin dem û cîh dizanin û tevî ku nikarin tu karên aqilane bikin, ew nêzîkî tiştên ku jê hez dikin dibin û ji tiştên ku jê hez nakin dûr dikevin. Ji ber vê yekê, hesasiyet çawa van tiştan bi dest dixe ku ew ne ji tiştan û ne jî ji rêza ramanê werdigire? Kant bersiveke bêhempa ji bo vê pirsê dide û dibêje: “bi rêya dengê xwe.” Li gorî Kant, ev form in û tenê dikarin bi rêya deng û hesasiyetê werin bidestxistin. Dem forma hesasiyeta hundirîn e; her hestek ku ji hundurê me tê bi demê ve girêdayî ye; cîh forma hesasiyeta derve ye; her hestek ku ji derveyî me tê bi cîh ve girêdayî ye.**

**Ev form, ku bêyî wan tu hest çênabe, “transandantal” in, her çend ew ne daneyên aqil bin jî. Ew ji ezmûnê têne wergirtin, lê ceribandin bêyî wan ne mumkin e. Li gorî Kant, zanîna “transandantal” nikare hebe, lê zanîna transandantal dikare hebe. Li gorî Kant, heke aqil ev peywir pêk neaniya, ne daneyên hestan û ne jî beşdariyên hestiyariyê nikaribûn daneyên zanistî pêk bînin.**

**Bi vî awayî, li gorî Kant, zanîn ne di asta tiştan de, lê di asta ramana aqil de tê pêkanîn. Bi vî awayî, Kant rêbaza xwe ya ramanê jî dibîne: rêbaza di ser cerebeyê re (transandantal medhode). Bi vê têgînê ku wî afirand, wî perspektîfa xwe ya rexnegir anî ziman, hem sansasyonelîzmê, ku dibêje zanîn berhema hestan e û hem jî rewşenbîriyê, ku dibêje ew berhema aqil e, derbas kir û angaşt kir ku rastî di serdestiya hevbeş a herduyan de ye.**

xwebûn

29 Îlon - 5 Cotmeh 2025/ e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 302

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan

**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/5 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Aşê Çawirmê

Mûsa Şanak

Em li Xinûsê bi rê ketin û berpêyî Tatosê bûn. Qasekê çûn û rastî Çemê Erezê hatin. Çem bi aliyekî de, em bi aliyekî de diherikîn. Dema em gihîştin cîhekî Hevserokê DEM Partiyê yê Erziromê bi tiliya xwe binê rê nîşan da û bala min kişand ser avahiyekê. Avahiyeke yek qatî û banê wê sackirî ya di navbera rê û Erezê de bû. Û got:

-Ev aşê me ye.

Ew Aşê Çawirmê bû.

Aşê Çawirmê yek ji wan aşên avê yên ku yek bi yek ji navê radibin bû. Wî aşî ez birim zarokatiya min. Li gundê me jî du aşên avê hebûn. Du sal berê hîn bûm ku bi salan berê lêserê ew dane ber xwe û car din kesî ew ji nû ve ava nekirine. Di nava xwe de biryarê didim ku ez ê rojekê bêm lê binêrim û çend wêneyên wî bikişînim. Axir ev roj hat û îro ez hatim serdana wî aşî.

Berî ku Tatos bibe navçe Çawirme bi Xinûsê ve girêdayî bûye. Ji xêncî wê li Xinûsê Çawirmeyeke din jî hebûye. Ji ya din re gotine Çawirmeya Fila û ji vê re jî gotine Çawirmeya Xelîl Axa. Mamoste Nasir dema behsa dîroka gund dike, dibêje ku "berê li vir û li gundên derdorê jî ermenî hebûne. Hin avahiyên aydê wan îro bûne kavil. Niha em biçin kîjan gundî rastî kavilên wan tên."

**Aşê Çewirmê**

Aşê Çawirmê di derdora 80-100 salî de ye. Berê hinekî din li jêr aşekî din ê hê kevnar hebûye. Em diçin li cîhê wî dinêrin. Ji xêncî cihoka wî ya herifî ya ku mîna xetekê dirêj dibe, zêde tiştek li paş nemaye. Aşê Çawirmê di heman demê de wek Aşê Mala Xalit Axa jî tê zanîn. Ava êş bi cihokekê ji Çemê Erezê hatiye veqetandin. Erez hê bi awayekî henûn diherike di rasta li binê êş de.

Heta heşt sal berê jî ev aş xebitiye. Dema rêya di navbera Xinûs û Tatosê de hatiye nûkirin, cihoka êş li ber rê ketiye û aş bêav maye.

***Ez li Mamoste Nasir mêze dikim û dibêjim:***

-Aşê dînan bêav jî digere. Ma qet dînek tunebû di mala we de?

Mamoste dikene û dubêje:

-Na. Em giş baqil in. Kes xwe li dînîtiyê danayne…

Karayollariyê cihokeke nû çêkiribe jî ev nizim maye û ji wê rojê û pê de aş betal bûye. Xwediyên êş doz li Karwyollariyê vekirine. Dadgeha wan bi salan e didome û hîn bi dawî nebûye.

***Mamoste Nasir dibêje:***

-Di nav 80 salan de tenê aşvanek jî derneketiye ji malbata me. Niha bi dehan hevparên vî aşî hene. Lê kesekî ku bixwaze û bikare wî ji nû ve sererast bike û bide şixulandin nîn e.

Bi min wisa tê ku aş bêxwedî û Erez xemgîn e.

Sê olixên êş hene. Du ji wan ji bo hêrandinê ne û yek jî ji bo dingê ye. Derî kilîtkirî ye. Loma me nekarî em bikevin hundir û li kevirên wî mêze bikin. Me ew çeqçeqên wê yên navdar ên ku bûne mijara gotineke pêşiyan jî nedîtin. "Aş çûbû, lê me nekarî ku em bikevin pey çeqçeqê jî."

Dema min çavên xwe girtin û xeyal kir, genim hêdî hedî ji kodê dirijiya wê qûla kêvir û bi zivirîna wî re bêhna ardê teze hat pozê min. Me wêneyekî dingê jî kişand di şibakê de. Ji dûr ve tenê qasnaxa dorê xuya dikir. Kevirê dingê di paş wê de mabû.



Ev newal bi rastî jî newala aşan bû. Ji diyarê Reman û Şeman derdibû, ji her gûndî şaxek an jî du şax lê zêde dibûn û mezin dibû. Li gundê me jî cîhekî bi navê Nala Êş hebû. Niha yek ji wan jî li ser pêyan nemaye. Ne aş mane li holê, ne cihokên wan û ne jî çeqçeqek maye ku kesek rabe û bikeve pey wê



**Newela Sêvan**

Ava Erezê, Aşê Çawirmê û qewaxên li hember deriyekî vedikin li pêşberî min. Di wî deriyî re diçim bi dehan salan berê. Diçim warê zarokatiya xwe. Li diyarê Reman û Şeman kaniyek derdibû û ber bi xwarê ve diherikî. Li vî alî û wî aliyê neqebê kaniyên din lê zêde dibûn û newal tije av dibû. Ji cîhê ku me pez û dewarê xwe lê av dida re digotin Nala(Newala) Sêvan. Bavê min bi salan naxirvaniya gund kir û min jî pê re gavanî dikir. Kengê me naxir bibirana wir, çavên min li darên sêvan digeriyan. Ji xêncî yekê min qet nedîtin. Lê ji navê wê jî diyar bû ku berê zêde bûne.

Newala Sêvan di navbera gundê me û Çîtaxê de bû. Dadiket di navbera gundê me û Gaxmûd, gundê me û Zelxidêrê re derbaz dibû, diket nav erdê gundê me. Di bin gundê me re derbas dibû, diçû sînorê di navbera Korkan û Bêroj de xêz dikir û li Nala(Newala) Êş tev li Çemê Pêriyê dibû. Nala Êş wek mezreya Bêroj dihat hesibandin.


Ne aş mane li holê, ne cihokên wan

Ev newal bi ra stî jî newala aşan bû. Ji diyarê Reman û Şeman derdibû, ji her gûndî şaxek an jî du şax lê zêde dibûn û mezin dibû. Qasî ku di bîra min de maye li binê Zelxidêrê Aşê Nirê, li gundê me Aşê Mala Mûsê(wek Aşê Memê Alî jî dihat zanîn. Çend şirîgên wî hebûn.), Aşê Mala Meymamê û Aşê Kurikan hebûn li ser vê newalê. Ev her çar aş jî heta salên heştêyî û nodî jî dixebitîn. Li gundê me jî cihekî bi navê Nala Êş hebû. Komek dartû hebû li wir û şivanan ew der wek cihê bêriyê bi kar dianîn. Cihekî bisih bû. Paşê hîn bûm ku berê li wir jî aşek hebûye. Niha yek ji wan jî li ser pêyan nemaye. Ne aş mane li holê, ne cihokên wan û ne jî çeqçeqek maye ku kesek rabe û bikeve pey wê. Ew aş û ding niha tenê di pêşangeha bîra min de hene û misêwa dizivirin… Porê min spî bûye. Lê min ew di êş de spî nekiriye!

---

Rohat Bulut

Di 6ê Sibata 2023an de, saet di 04:17 û 13:24an de du erdhejên bi pileya 7.7 (bi kûrahiya 8.6 km) û pileya 7.6 (bi kûrahiya 7.6 km) çêbûn ku navenda wan li navçeyên Pazarcik û Elbistanê yên Gurgumê bûn, pêk hatin. Desthilatiyê û bi taybetî jî Serokomar Recep Tayîp Erdogan hema piştî erdhejê gotibû dê di nava salekê de li şuna avahiyên ku hilweşiyane yên nû avabikin û dê her kes bibe xwediyê xaniyên xwe. Lê belê ev gotin li hewa ma û di ser de jî mexdûriyeteke mezin dan avakirin. Hêj jî bi hezaran avahiyên ku xisar dîtine li benda hilweşînê ne û yên ku hilweşiyane, hatine hilweşandin jî şûna wan ne li gorî hawirdor û civakê ye. Ev rewşa ku xuya dike di warê derûnî de neyîniyekê ava dike.



Di despêkê de pêvajoyeke hilweşandina van avahiyan heye û pêwîst e li gorî wê hilweşîn pêş bikeve: Avahiyên ku di erdhejê de xisar dîtine piştî hin kar û barên fermî û destûrdayînê tên hilweşandin. Di destpêkê de ji hêla peywirdarên girêdayî Wezareta Jîngeh, Bajarvanî û Guherîna Avhewayê yan jî saziyên destûrdayî tespîta xisara madî tê kirin. Piştre jî pêvajoyeke hiqûqî û hawerdorî ya hilweşandina avahiyên ku piştî erdhejê xisar dîtine heye. Piştî pêvajoya hiqûqî û wergirtina biryar, ya ji hêla xwediyên wan bi xwe hilweşandina avahiya pêk tê yan jî ji hêla şaredarî û walîtiyê ve hilweşandin tê kirin. Lê di encamê de şîrketên ku bi destûr vê hilweşandina avahiyan pêk tînin hene. Dema ku biryar tê dayîn, hilweşandin ji hêla şîrketên hilweşandinê yên ku ji şaredariyê destûra fermî wergirtine ve tê kirin.

Bêguman pêvajoyeke vê heye. Piştî tespîta xisarî û biryara hilweşînê ya pêvajoya hiqûqî, heke bixwazin xwediyê avahiyan bi xwe dikarin bi şirketên destûrdayî re peymanê çêbikin û bi derfetên xwe avahiyê hilweşînin. Ji bo avahiyên ku di asta xetereyê de têne tespîtkirin, bi gelemperî ji xwediyên wan re demeke bi qasî 90 rojî tê dayîn. Heke di vê demê de hilweşandin pêk neyê wê demê, rêveberî (şaredarî an walîtî) fermana hilweşandina avahiyê dide.

Di vê navberê de piştî ku biryara hilweşandinê, ji aliyê saziyên eleqedar ve elektrîk, av û gaza xwezayî tê birîn. Pişt re şirketa ku destûra hilweşandinê werdigre dest bi hilweşandinê dike. Heta vê qonaxê yanî prosedurên fermî ên beriya hilweşandina avahiyê pirsgirêk xuya nake lê bi destpêkirina hilweşandinê re gelek pirsgirêkên cuda rû didin.

**Hilweşîneke bêpirsgirêk tune ye**

Di dema hilweşandina avahiyan de tedbîrên berfireh ên ewlehiyê nayên girtin, bi nêzîkatiya hesasiyeta hawirdorê û civakê hilweşîn pêk nayê. Her wiha di hilweşandinê de xisareke zêde ya madî li derdorê tê barkirin. Hilweşandineke ku bêpirsgirêk pêk hatibe tune ye. Hin pirsgirêkên ku rû dane û rû didin jî em vebêjin dê mijar baştir bê fêhmkirin:

Yek; hemû toz û gemara ku belav dibe xwe li hundirê malan, li mirovan, dar û beran digire û rê li ber jehrîn û nexweşiyan vedike.

Du; cihê avahiya ku tê hilweşandin û derdora rê û peyarê hemû xira dibin, welatî di çûn û hatinê de zehmetiyan dikişîn in.

Sê; Makîneyên kar û yekîneyên ku hilweşînê pêk tînin, xisarekê didin avahiyên derdorê û dibe sedema hilweşîn an jî xisara zêde.

**Çi bi sere vê avahiyê hatiye?**

Li vir tişta ku bû mijara sereka ya nivîsa me jî ev xala sêyemîn a ku me behs kir e. Lewre li gel ev pirsgirêkên ku me anîn ziman gelek avahiyên saxlem jî bi yên ku tên hilweşandin xisareke mezin a madî dibînin. Yek ji van avahiyan jî (Apartmana Bûhara) ya ku di wêneyê me de jî xuya dibe li kolana 478an a Taxa Mevlanan Xalit a Navçeya Rezanê ya Amedê ye. Di 10ê kanûna 2024an de dema ku avahiya kêleka wê tê hileşandin ew jî xisareke mezin dîbîne. Di wêneyê de jî tê tîtin ku çi bi serê avahiyê hatiye. Avahiya ku di erdhejê de xisar nedîtiye ji ber hilweşandina avahiya kêlekê, xisareke giran dîtiye û divê bê valakirin. Bi giştî 30 malbat lê dijîn û piştî vê rewşê mexdûr bûne. Piştî ku xaniyên wan xira dibe ji neçariyê derdikevin. Lê ji ber şert û mercên giran ên aborî careke din neçar dimînin ku şûn ve vegerin. Ji niştecihê avahiyê Sebîha Candan dibêje di despêkê de ew çûne qeymeqamiya navçeyê, çûne Rêveberiya Jîngeh û Bajarvaniyê lê ji wan re gotine tiştê ji destên wan nayê. Ji ber vê yekê wan jî doz vekirine. Welatî li ser mexdûriyeta xwe dozê li qeymeqamiya Rezanê vedikin. Li gorî rapora ku kesên pispor amade kiriye jî qusûra zêde ya firmaya hilweşandinê ye.

Li gel ku di ser de 10 meh derbas bûne jî hêj mexdûriyeta welatiyan nehatiye derbaskirin. Welatî ji neçariyê di avahiya xirabe de rûdinên. Welatî li bendê ne doz bi necam bibe û mexdûriyeta wan derbas bibe. A rast ev tabloya, nêzîkatiya dewlet û desthilatdariyê ya li welatiyan dide xuyakirin. Heke li vî welatî hiqûq, edalet û mafên mirovan hebûna dê ev nehata jiyîn. Lê mixabin tabloyên wiha li welatê me gelekin.